

## Zarok li şûna dibistanê berê xwe didin kar

**BI** hatina biharê re ji Bakurê Kurdistanê her sal bi hezaran zarok ji malên xwe dûr dikevin, ber bi herêmên cuda yên Tirkiyê ve diçin û di şert û mercên dijwar de kar dikin.

RÛPEL 09



## Mukaddîmet-ûl Îrfan û M. Mîhrî Hîlav

**MUKADDÎMET**-ûl Îrfan, kitabo yewin o ke fonetîka ziwanê kurdî ser o ameyo nuştiş û serra 1918î de Îstanbul de çap bîyo. Goreyê nê kitabî ziwanê kurdî eslê xo de di qismî yo.

RÛPEL 11




## Tunekerina dîrokekê: Heskîf di bin avê de dimîne

**TIRBA** Zeynel Beg ya li Heskîfê ku 650 salî ye, ji bo di bin avê de nemîne bi minasebeta projeye Bendava Îlisûyê ji cîhê wê yê resen vegûhestin bo cihekî din.

RÛPEL 14


# bas

HEFTENAMEYA NÛÇEYÎ Û ŞIROVEYÎ
HEJMAR: 20
22 - 28 GULAN 2017
www.basnews.com

**HIKÛMETA KURDISTANÊ** S2

# JI BO NAVBEYNKARIYA AKP Û PYDê AMEDE YE

### > SERDANA MESRÛR BARZANÎ YA DYA'yê

Şêwirmendê Encûmena Asayîşa Kurdistanê Mesrûr Barzanî di serdana xwe ya ji bo DYA de destnîşan kir ku ji bo proseyeke nû di navbera PKK/PYD û Tirkiyeyê de Hikûmeta Kurdistanê amade ye navbeynkariyê bike.

### > HERÊMA KURDISTANÊ NABE QADA ŞER

Herêma Kurdistanê dixwaze bibe navbeynkar da ku kêşeya Kurdî li Bakur çareser bibe û eger rêya diyalogê nebe Herêma Kurdistanê tu car nabe qada şerê di navbera Tirkiyeyê û PKK û şerê li dijî tu hêzên Kurdî.



**EKREM ÖNEN** >02

Geopolîtîka: HevdîtinaTrump û Erdoğan



**MURAD CÎWAN** >04

378 Saliya dubeşbûna kurdistanê: Peymana qesra şêrîn II



**HOŞENG OSÊ** >05

YNK, PKK û "qantona" Sulêmaniye-2

S3 MIHEMED HACÎ MEHMÛD:



## Kurd di serdema xwe ya herî bihêz de ne

"Kurd di tu deman de biqasî îro ne bihêz bûn û piştgiriyeke zêde wernegirtîbûn. Ez bawer dikim ku eger em vê carê yekitiya xwe ava bikin, em ê destkeftiyên mezin bidest bixin."

S5 BERIYA REFERANDÛMÊ



## Parlamentoya Kurdistanê çalak dibe

Hikûmeta Kurdistanê ku biryara pêkanîna referandûmê daye, amadekariyên çalakkirina parlamentoyê dike. PDK û YNK di wê baweriyê de ne ku beriya referandûmê, çalakkirina parlamentoyê wê gaveke girîng be.

S8 ENCAMÊN PENABERIYÊ:



## Têkiliyên Tirkiye û Almanyayê xera kir

Têkiliyên Almanya û Tirkiyeyê di tengezariyê de ne. Almanyayê serlêdana penabertiyê ya leşkerên pilebilind yên Tirk qebûl kir, Tirkiyeyê jî serdana baregeha Încîrlîkê ret kir.



EKREM ÖNEN

## Geopolîtîka: HevdîtinaTrump û Erdoğan

Hefta borî di navbera Erdoğan û Trump de hevdîtin pêk hat. Ev hevdîtin demeke dirêje bi teybetî li Tirkiyê û derdora wê guftûgo dihate kirin ku wê çi encam jê derkevin. Her çiqas hinek pirsên din hebin jî lê li dor du pirsên esasî kete rojeva Tirkiyê û DYA.

Pirsa yekemîn Suriyê bi tevayî û pirsa têkilîyên DYA bi Kurdan re û radestkirina Fethullah Gülen bû. Hîn beriya Erdoğan serdana DYA bike, berpirsên DYA di beyanên xwe de sergirtîbe jî be di van pirsan de wê daxwazên Tirkan pêk neyên, lê Tirk her bi hêvîbûn. Berî û piştî serdanê sê pirsên girîng bala min kişandin. Yekem beriya Erdoğan biçe DYA di medya Tirkan de berpirsên dewletê digotin; ”Bombebarankirina çekdarên Kurd li Rojavayê Kurdistanê dikare bi şaşî li leşkerên DYA jî bikeve her weha heger çekdarên Kurd êrîşî me bikin em ji kesî destur naxwazin emê êrîş bikin.” Piştî hevdîtinaTrump û Erdoğan jî siyasetvan û ekspertê Tirkan ku xwe nêzîkî Yekîtiya Awrûpa dibînin gotin; ”Dikare bi şaşî tiştekî wek xistina balefira Rûsya bi DYA jî bibe yanî bi şaşî balefirên me li Sûriyê dikare balefirê DYA bixe”. Di dîplomasiyê de ev bi agir lîstine. Di dîplomasiyê de navê vê ya tehdîde.

Pirsa dûdan beriya hevdîtina Trump û Erdoğan. Pûtîn li Çînê di press konferensa de got; ”Têkiliyên me bi Kurdan re hene û wê dewam bikin, ji ber yê ne fektîv şerê terorîzmê dikin hêzên Kurdin, tu sebeb tuneye Tirk aciz bibin, em çeka nadin Kurdan hewcedariya wan jî bi çekên me nîne, rêyên din ku ew çeka bi dest dixin hene”. Gelek exspertên welatên YE, DYA û Rûsya dihesibînin heger nêtek Trump di derbarê şervanên Kurd hinek daxwazê Tirka pêk bianya, piştî beyana Pûtîn, Trump jî di vê pirsê de tu daxwazê Tirkan neanî cîh. Beyana Pûtîn û helwesta Trump îşareta ku di pirsa Sûriyê û herêma rojhilata de li hevkirinek bidizî heye. Pirsa sisêya pirsa protokola hevdîtinê ye. Hevdîtina serokan 20 deqan ajot, wateya wê tiştekî nû em ji hev re bêjin nîne, wek mêvanekî tiştekî zêde pê re bipeyivim tune. Beriya sê rojan Trump bi wezîrê derve ê Rûsya Lavrov û balyozê Rûsya li DYA re hevdîtin pêkanî hevdîtinek dirêj û di dîplomasiyê de wek lazim bû Trump mezûbantî kir, di hevdîtina Trump bi Lavrov re pirsa dana çekan ji bo şervanê Kurd bi erênî hatiye gotûbêj kirin. Di medya DYA de serdana Erdoğan pir kêm hate rojevê ew jî îşareta ku giringîyek pir nadin vê serdanê.

Dema mirov li berpirsên Tirka guhdar dike dibê qey ev dinya tev li dora Tirkiyê dizîvire û di merkeza cîhanê de ye. Lê Tirk nikarin fam bikin ku cih û rola wan a di nîzama piştî şerê cîhanê yê duyemîn di navbera Sovyet û welatên rojava de hatibû avakirin di sala 1991ê de bi belavbûna Sovyetê xerabû. Niha DYA û Rûsya ji bo nizameke nû li cîhanê di nava hevkarî û gengeşiyekê de ne. Di navbera wan de Tirkiye perçakî pir piçûk di nav van problemên global deye. Lê Tirk dixwazin ew di merkezê de bin, DYA û Rûsya bi wan bişêwire wê li vê cîhanê çibikin û di vê nîzama nû de cihê Tirkî ya îro li ku ye û wê ev Tirkiya îro bi tevayî ji Tirkan re bimîne an na? Lê ne DYA û ne jî Rûsya her çiqas Tirkî wek terefekî di pirsgirêkên herema rojhilata nêzîk û navîn û bi teybet di pirsa Kurdan de qebûl bikin jî lê ehmiyeteke wek Tirk dixwazin nadin wan. Tirk ji Rûsya û DYA daxwaza garantiya di vê nîzama nû a ku niha DYA û Rûsya li ser tevdigerin Tirkiya îro wek heye dest nedinê û ji Tirkan re bihêlin lê weha diyare ne DYA û ne jî Rûsya garantiyek weha nade. Tişta rê li ber Tirka şaş kiriye ev e. DYA û Rûsya bi Tirkan didin fam kirin ku lazime lingê xwe li gor lihêfa xwe dirêj bikin. Tirk bi vê ya razîne bes bi şertekî ku Rûsya û DYA garantiya Tirkî ya îro ji Tirkan re bihêlin. Beyanên berpirsê Tirka ku “dikarin bi şaşî balefira DYA bixin” an “roketên wan dikare bi şaşî li leşkerên DYA bikevin.”

Rewşa DYA ku dezgehên wek pentagon admînîstrasyona Trump û kongre ku ne li hevin niha eşkere bûye. Wek minak beriya heftekê Trump serokê FBI guhert piştî heftakê kongre seroke FBI ê beriya ku Trump ew guhert kir berpirsê komîsyona tehqîka ku tesîra Rûsya di hilbijartinê DYA de heye an na. Wezîrê derve yê DYA dixwazê bêhtir personelê wezareta derve biguhere. Eşkereye Trump her çiqas serokdewlete bes di jêr de hê hevalbendên xwe bi temamî bicîh ne kirine. Ev protses wê çiqas dewam bike hîn nediyare. Heta mirov dikare bêje gelo Trump dikare beriya wextê dev ji hikum berde? Ji ber van tişta teva bêîstiqrariyek mezin di têkiliyên Tirkiyê û DYA de heye heger di demên pêşiya me de bi provakasyonekê çi ji alî DYA çi ji alî Tirkan de buyerek wek balefira Rûsya ku Tirka xist di navbera DYA û Tirkan de bibe ne pir xerîbe. Her weha piştî ku Trump bi temamî li DYA hikum bi dest xist dikare gavên gelek pozîtîv ji bo Tirkiyê bêneavêtin. Demên pêşiya me bi suprîzan dagirtiye divê Kurd ji van suprîzana re hazir bin.

Hikûmeta Kurdistanê

# Amade ye ku ji PYD û AKP re bibe navbeynkar




Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî dibêje ‘Ez amade me ji bo çareseriya kêşeya Kurdî ya li Tirkiyeyê bibim navbeynkar’ Serok Barzanî, “Dema înkarkirina Kurdan derbas bû, înkara Kurdan faydeyê nade tu welatan. Lê belê divê Kurd jî ji bo bidestxistana maf û parastina nasnameya xwe rê û rêbazên aştiyane bimeşînin.”

**ŞÊWERMENDÊ** Encûmena Asayîşa Kurdistanê Mesrûr Barzanî di serlêdana xwe ya ji bo DYA de destnîşan kir ku ji bo proseyeke nû di navbera PKK û Tirkiyeyê de, ji bo diyaloga di navbera Tirkiyeyê û YPG de Herêma Kurdistanê amade ye rola xwe bileyîze. Şêwermendê Encûmena Asayîşa Kurdistanê Mesrûr Barzanî ligel heyeta payebilind ya Kurdistanê di 14’ê Gulanê de serlêdana DYAyê kirin û bi Serokatiya Şêwermendê Sereke yê Serokê DYAyê Donald Trump, Jared Kusher û heyeta Komîsyona Ewlekariyê ya Amerîkî civiyan. Civîn li Qesra Spî pêk hat û di civînê de têkiliyên Hewlêr-Waşîngton, proseyeka nû li Tirkiyeyê, kêşeya di navbera Tirkiyeyê û YPG de hatin rojevê. Li gor agahiyên Heftenameya Basê ku ji Berpirsyarên Hikûmeta Herêma Kurdistanê wergirtine: Şêwermendê Encûmena Asayîşa Kurdistanê Mesrûr Barzanî, di serlêdana DYAyê de gotiye; Eger li Tirkiye proseyeke nû destpê bike dê Herêma Kurdistanê piştgirî bide vê proseyê.” Wî berpirsyarî destnîşan kiriye ku: Eger di navbera Tirkiyeyê û YPGê de hevdîtin pêk werin em amade ne bibin navbeynkar da ku têkiliyên Tirkiyeyê ligel YPGê baş bibin. Tirkiye jî ji bo destpêkirina diyalogên ligel YPGê şertê xwe ji PKKê durxistinê datîne pêşberî YPG. Berpirsyarên Tirk di serlêdanên li DYAyê de gotibûn ku “Eger YPG, xwe ji PKK dûr bixe û vê baweriyê bide me em ê rêya diyalogê ji bo YPG vekin.” Herêma Kurdistanê, dixwaze bibe navbeynkar da ku kêşeya Kurdî li Bakur çareser bibe û her wiha ji bo çareseriya pirsgirêka di navbera Tirkiye û YPG de roleke aştiyane bigire. Mesrur Barzanî, eger rêya diyalogê nebe Herêma Kurdistanê nabe alî û qada şerê di navbera Tirkiyeyê û PKKê de. Herêma Kurdistanê tu car nabe qada şerê li dijî hêz an jî rêxistineke Kurdî.

### “Divê Kurd bi Hikûmeta navendî re diyalogê deynin”

Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî jî di heman demê de dibêje ‘Ez amade me ji bo çareseriya kêşeya Kurdî li Tirkiyeyê bibim navbeynkar’. Serok Barzanî, “Dema înkarkirina Kurdan derbas bû, înkara Kurdan jî faydeye nade tu welatan. Lê belê divê Kurd jî ji bo bidestxistana maf û parastina nasnameya xwe rê û rêbazên aştiyane bimeşînin.”

### “Ger piştgiriya daxûyaniyên Barzanî bê kirin…”

Siyasetzan Fatih Çiçek: “Divê piştgiriya daxûyaniyên Mesrur Barzanî bên kirin” û dibêje: “Em amade ne di navbera Tirkiye û PKK, Tirkiye û YPG de bibin navbeynkar.” Û wiha pê de diçe: “Divê hemû hewldanên ji bo proseyeke nû destpê bike piştgirî bibînin.” Çiçek radigihîne, pêdiviya Kurdan di nav xwe de jî bi proseyeke çareseriyê heye “Divê Kurd dev ji sûcdarkirina hev berdin û di nav xwe de yekîtiyê ava bikin.”

Siyasetmedarê Kurd Rizgar Kêsteyî, divê li Rojavayê Kurdistanê hêzên bi ser PKK de berjewendiyên hemû Kurdan û Kurdistanê esas bigirin. Divê ev hêz bi ENKS re rûnin û şertên vegera Pêşmergeyên Roj ava bikin. Kêsteyî dibêje: “Eger PYD dev ji polîtîkayên li gor berjewendiyên Îranê û Rejîma Esad berde wê Tirkiye bi PYD re têkiliyên xwe baş bike û Hikûmeta Herêma Kurdistanê jî amade ye di vê mijarê de rola xwe bileyîze.”

### “Tirkiye, pêwîstiya diyalogdanînê dizane”

Çavdêrê Siyasî li Herêma Kurdistanê Polla Omer balê dikişîne ser gotina, Serokê PYD Salih Muslîm ku herdem dibêje: “ Em ne li hember dewleta Tirkiyeyê ne.” “ Mîna berê îro jî Salih Muslîm dibêje em dikarin ligel Enqere têkilî deynin” Omer têkilîdanîna ligel Enqereyê pêwîst dibîne û wiha dibêje: “Hidûdê Tirkiye û Rojava 900 Kîlometre ye. Di pêşerojê de ev sînor dê warê aborî û siyasî de gelek bi tesîr be. Li aliyê din jî têkiliyên çandî û merivatiyê jî divê neyên paşguh kirin. Zarokên heman gundî ji ber sînor ji hev cûda bûne. Muslîm, ‘Em ne PKK ne, em dixwazin ligel Tirkiyeyê têkilî deynin. Dixwazim bi wezîrê derve yê Tirkiyeyê re hevdîtinekê bikim, belkî em baştir xwe îfade bikin’ Hevserokê PYD jî dizane dawiya dawî divê ligel Tirkiyeyê têkilî bê danîn û dibêje hîn tiştek neqediyaye. Piştî DAÎŞê dê bibin du hêzên cîran Rojava û Tirkiye.”

### Gelo PKK di tengasiyê de ye?

Serokê DYAyê Donald Trump û Serokkomarê Tirkiyeyê Recep Tayip Erdoğan di 16’ê Gulanê de hevdîtin pêk anîn. DYA, di mijara PKK de dê alîkariya Tirkiyeyê bike û dê daneyên îstîxbarî û piştgiriya lojîstîk bidomîne. Piştî daxûyaniyên her du welatan tê îddîakirin ku dê DYA ne tenê ji bo Şengalê, ji bo Qendîlê jî dê alîkariya Tirkiyeyê bike. PKK, piraniya hêzên xwe vekişandiye Rojavayê Kurdistanê û Şengalê. Tê îddîakirin ku li Qendîlê Gerîlayên PKK gelek kêm in. Ji ber vê yekê jî tê îddîa kirin ku PKK di tengavê de ye.

### Kurdistan ji bo diyalogên ligel PYD amade ye

Siyasetmedarê Kurd Rizgar Kêsteyî: “Herêma Kurdistanê êdî li Rojhilatanavîn aktor e.” Herêma Kurdistanê ji mêj de dixwaze rola xwe di navbera Tirkiye-PKK û Tirkiye YPG de bileyîze. Herêma Kurdistanê PYD û ENKSê li Duhok û Hewlêrê anîn cem hev. Mixabin PYD ev bikarneanî. Eger PKK/PYD li van peymana sadiq bimana wê li Rojavayê Kurdistanê jî mîna Herêma Kurdistanê statûyek bidest xistana. Dê cîhanê jî bipejiranda û niha dê meşrû bûna. Niha Rojavayê Kurdistanê tê dabeşkirin. Rojavayê Ferêt di bin qontrola Rusya-Îran-Suriyeyê de ye, Rojhilata Ferat jî di bin qontrola Amerîka de ye. Lê belê hê jî ne dereng e ji bo vegera ji şaşiyan. Eger hêzên bi ser PKK de li Rojavayê Kurdistanê li gor berjewendiyên Kurdan tevbigerin, bi ENKSê re danûstandinan bikin û destûra vegera Pêşmergeyên Roj bide dê rêyên diyalogê ji nû ve vebin. “ Eger PYD dev ji polîtîkayên li gor berjewendiyên Îranê û Rejîma Esad berde wê Tirkiye bi PYDê re têkiliyên xwe baş bike û Hikûmeta Herêma Kurdistanê jî amade ye di vê mijarê de rola xwe bileyîze.





Herêma Kurdistanê dixwaze bibe navbeynkar da ku kêşeya Kurdî li Bakur çareser bibe û her wiha ji bo çareseriya pirsgirêka di navbera Tirkiyeyê û YPG de roleke aştiyane bigire. Mesrur Barzanî, eger rêya diyalogê nebe Herêma Kurdistanê nabe alî û qada şerê di navbera Tirkiyeyê û PKK de. Herêma Kurdistanê tu car nabe qada şerê li dijî hêz an jî rêxistineke Kurdî.

Mihemed Hacî Mehmûd:

# Kurd di serdema xwe ya herî bihêz de ne



## MIHEMED HACÎ MEHMÛD

Sekreterê Giştî yê Partiya Sosyalîst Demokrat a Kurdistanê (PSDK) Mihemed Hacî Mehmûd, li ser mijarên şerê li dijî DAIŞ'ê, referandûma serxwebûna Kurdistanê, proseya serxwebûnê û geşedanên li herêmê, bersiva pirsên Basê da.



BARHAM MUSTAFA

**Hûn niha rewşa Herêma Kurdistanê çawa dibînin?**

Li Herêma Kurdistanê, Îraqê û li tevahiya Rojhilata Navîn di warê siyasî û leşkerî de guhertinên mezin pêk tên. Ev guhertin jî bêyî acizî nabin. Di herêmê de şer, krîz, alozî û rikberiyeke siyasî heye. Tunekirina DAIŞ'ê nêzîk e. DAIŞ'ê di maweyê 3 salan de ji hemû aliyan ve êrişî Kurdistanê kir. Cîhan jî beşdarî vî şerî bû piştgirî da me. Me di vî şerî de gelek şehîd dan û gelek birîndarên me hene. Lêbelê me weke Kurd gelek destkeftî jî bidest ve anîn. Li gorî min Kurd di tu deman de biqasî îro bihêz nebûn û ne xwedî piştgirî bûn. Eger em yekgirtineke xurt ava bikin, em ê destkeftên zêde bidest bixin.

**Tê ragihandin ku îsal wê referandûma serxwebûnê bê encamdan. Kurdistan, di warê sîyasî de ji referandûmê re amade ye?**

Ez ne kesayetekî siyasî me û tenê têkoşîna xwe berdewam dikim. Referandûm meseleyeke gelek girîng û mezin e. Referandûm tê wateya wergirtina nêrîna milet û xelkê. Yewnanîstanê beriya niha ji bo man an derketina ji Yekitiya Ewropayê (YE) referandûmek pêk anî û piştî ku pirsgirêkên xwe çareser kirin, tevî referandûmê jî di nava YE'yê de ma. Dîsa van rojan li Brîtanyayê ji bo ku ji YE'yê derkeve referandûmek encam da û ji YE'yê derdikeve. Weke min got di referandûmê de milet li ser îradeya xwe biryar dide. Referandûm ew e ku hêz an partiyek îradeya xwe li ser xelkê ferz neke. Niha hinek alî hin pirsgirêkan bo xwe dikin hincet û li dijî encamdana referandûmê derdikevin. Lêbelê referandûm mafekî rewa yê miletê me ye. Di vê referandûmê de wê ji milet bê pirsîn 'Hûn dixwazin bi Bexdayê re bimînin, an serbixwe bibin'. Referandûm ji bo veqetîna ji Îraqê wê karteke bihêz be. Bi pêkanîna referandûmê em ê nêrîna miletê xwe ji Bexda, DYA, Ewropa û ji hemû cîhanê re ragihînin. Em ê girêdayî Îraqê bin, lêbelê Îraq wê bûtçe û mûçeyan bibire, di nava şert û mercên şer de hemû cîhan wê alîkariya me bike, lê Îraq çek û alîkariyan nade me! Gelek bac û gumrukên me mane ligel Îraqê û ev kiryarên îraqê hemû li dij û derveyî destûra Îraqê ne jî. Em ne şirîkekî wekhev yên Îraqê ne, wezîrên me tên derxistin. Madem ku hûn destûra xwe jî bicî nayînin, wê çaxê tenê rêyek dimîne li ber me, ew jî serxwebûn e. Eger em îsal yekgirtina xwe ava bikin û referandûmê pêk bînin, ji bo miletê me wê destkeftên gelek girîng û mezin bidest bikevin. Eger PDK û YNK bi hev re tevbigerin, bêguman îsal wê referandûm pêk were. Eger her du partî bi hev re tev negerin û rêknekevin, divê PDK li herêma ser (herêmên ku PDK lê serdest e) û YNK jî li herêma kesk (herêma ku YNK lê serdest e)



her yek referandûma xwe pêk bînin.

**Ji bo referandûmê çend heyet hatibûn avakirin. Dê hin ji van heyetan serlêdanên Tirkiye, Îran û Îraqê bikirana, Îraq ziyaret kirin gelo Tirkiye û Îran dê kengî bêne ziyaretkirin?**

Belê dê çend heyet bêne avakirin û her heyetek dê xwedî peywirek cûda be. Heyetek dê referandûmê îdare bike. Heyetek ji bo danûstandinan dê biçe Bexdayê. Yek dê biçe Ewropa, yek dê biçe dewletên cîran. Ev heyet di serî de dê li gor rêkeftina YNK û PDKê pêk bin. Gava yekem çûyîna Îraqê bû û ev yek pêk hat. Yên din jî girêdayî rêkeftina di navbera YNK û PDKê de ye.

**Berpirsyarên Kurd dixwazin ku her kesek tevlî proseya referandûmê bibe. Lê niha bûne du beş û du nêrîn hene li holê. Nêrînek dibêje ger parlemento çalak bibe û aliyên siyasî li wir li hev bikin. A din jî dibêje bila parlemento çalak bibe lê em dikarin bêyî parlamentoyê jî li hev bikin û referandûmê pêk bînin. Hûn çi difikirin di vê mijarê de?**

Tenê Hikûmet jî dikare referandûmê bike. Biryara parlementoyê ne pêwîst e. Li gorî me jî divê parlemento çalak bibe û civînên asayî bên kirin. Lê belê parlemento çalak nebe jî li pêşiya referandûmê nabe astengî. Li hemû cîhanê parlemento pirsgirêkên gel çareser dike lê li Kurdistanê parlemento bûye navenda pirsgirêkan.

**Goran dide xuyakirin ku "Eger parlemento çalak nebe em tevlî proseya referandûmê nabin" hûn çi difikirin?**

Referandûm û Dewleta Kurdan, du meseleyên ku aliyên siyasî ne di heman fikrê de ne. Yanî em ji bo van her du meseleyan ligel hev ne civiyane. Her kesek xwedî nêrîn e. Li gor min PDK û YNK dikarin vê astê ligel hev derbas bikin. Me asta federaltiyê derbas kiriye, ya em ê bibin konfederal yan jî em ê bibin dewleta serbixwe. Em dikarin bibin mîna Îmareta Ereban. Tu alî li hember mijara referandûmê dernakeve. Tu alî li hember bilindkirina ala Kurdistanê li Kerkûkê derneket. Mijarên netewî li pêşiya mijarên hizbî tên.

**PDK û YNK ligel hev biryara referandûmê dikarin bidin lê YNK di nav xwe de bibe yek û mil bi mil ligel PDKê be, YNK dikare bêyî Goranê vê biryarê bide?**

YNK niha nikare tu biryarî bide. Du rê li pêşiya YNKê hene an dê ligel PDKê an jî dê ligel hevalbendê xwe yê nû Goranê be. YNK nikare her du partiyan îqna bike. PDK jî bi vî halî YNKê pesend nake. Divê YNK bi biryar be. Ji ber ku hêza wê û îktîdara wê ya herêmî heye. YNK bi vî halê xwe bimîne dê gel zirar bibîne.

**Hûn di nav heyeta dawî ya Kurdistanê de bûn ku çûn Bexdayê. Nêrîna Bexdayê çiye?**

Belê em axivîn, ew ne li hember in, dibe ku tevan nepejirandi be jî. Lê me ji wan re got, em şirîkên ne baş bin jî em dikarin bibin cîranên baş. Ji me re gotin; 'Mafê we ye. Lê em bi hev re bijîn dê baştir be. Divê em li ser vê yekê biaxivin û heyeteke hevpar ava bikin'.

**Hûn fermandarekê Pêşmerge ne û we li hember DAIŞê gelek li ber xwe da. Hin heremên ku divê di çarçoveya xala 140'an de bên rizgar kirin man. Li gorî we ev herêmên ku heta Hemrînî ne divê bên rizgarkirin an cihên ku hatine rizgarkirin bes e?**

Bê guman ev cihên ku me rizgar kirine têrê nakin. Lê di derheqê cihên ku bên rizgarkirin de ne tenê Kurd ne jî Iraq dikare biryarê bidin. Ji ber ku li herêmê hêzên koalîsyona navneteweyî yê DYA'î heye û heta ku em fikira wan negirin nikarin wan herêman bi dest bixin. Divê ev mijar bi Iraqê re jî bê xeberdan. Ji ber ku Iraq wan cihan wek ya xwe dihesîbîne û em jî wan cihan wek ya xwe dihesibînin. Ez wisa difikirim ku me cihên li kêleka Hawîce, Reşad, Riyaz, Hemrîn ji %50 î rizgar kiriye. Hêza me heye û em dikarin heta Hemrînê biçin lê belê heya destûra Amerîkayê nebe em nikarin tiştekî bikin.

**Meseleya Haşdî Şabî û Pêşmergeyî çi ye? Gelo we qet bo çareseriya pirsgirêka wan her du hêzan tiştin bihîstin. Di navbera Haşdî Şabî û Pêşmergê de şerek derkeve? Ger wan şer pêwîst dît û şer kir hûnê jî şer bikin?**

Niha Iraq bûye sê perçe, dewletek erdnîgariya xwe de bûye wekî sê erdnîgarên ji hev cuda. Her sê terefan jî hêza xwe ya bi taybet amade kirine. Hêza Kurdistanê Pêşmerge ye. Hêza Şiiyan Haşdî Şabî ye. Hêza Sûniyan jî Haşdî Wetan e. Em di desthilatiya sûnî ya 80 salên Dewleta Iraqê de bi bombeyên kîmyewî rastî komkujî û Enfalan hatin. Di deshilatiya Şîiyan ya 11 salî de jî mehanî û budçeya me nayê dayîn û DAIŞ derket holê. Divê em riyeke din bibînin û li ser vê hewldaneke baş bidin. Me bi DAIŞ re şer kir û gelek şehîd dan. Me êrîşî wan nekir û şer neda destpêkirin. Wan Êrîşî me kir û şer dan destpêkirin û me ew dan sekinandin. Divê ev yek li hemû cîhanê û dewletên li derdorê me re bibe peyamek. Vîna gelê me DAIŞ da sekinandin. Eger hêzek din derkeve holê û êrîşî me bike bê guman emê berxwe bidin.

**Serokê Parlamentoya Iraqê Selîm Ciburî daxuyaniya xwe ya dawî de, "Ger yên ku naxwazin di nav dewletê de bijîn bila bikevin pey neteweke din." Ji bo vê bersivek we heye?**

Ez dikarim tenê vêya bibêjim; Bila Serokê Parlamentoyê birêz Ciburî pêşî bira/xwîşa xwe ya li Kelarê û mala xwe ya li Hewlêrê bibe nav miletê xwe, nav Iraqê û bila paşê biaxive.

**PKK li hin herêmên Silêmaniyê li Ranya, Helepçe, Qeladizê û herî dawî jî li Kerkûkê baregehên xwe ava kirine. Gelo ev yek bi razîbûna YNKê pêk tên?**

Çend sedemên vê yekê hene. Bi razîbûna aliyekî YNKê ku li dijî PDKê piştgirî dide PKKê, û hin pirsgirêkên li Herêma Kurdistanê dibe sedema ava kirina baregehên PKKê.

**Tê îddîa kirin çêkên ku DYA'yê daye YPG li Şengal û Qendilê dane PKK jî. Ger ev yek rast be, bi çekkirina PKK ya Şengal û Qendîlê bo Herêma Kurdistanê wê talûkeyek nebe?**

Heke tiştek wisa hebe divê rayagiştî re bê ragihandin.

**Li sînorê ku hûn lê ne, hêzên Îranî jî hene. Hebûna hêzên Îranî li wê deverê ji bo Kurdistanê gelo ne gef e?**

Îran li herêmê dewleteke bi hêz e ji ber vê yekê jî hêzên wan li vir hene. Ji ber ku ew jî li dijî DAIŞê şer dikin. Tevlî siyaseta Îraq û Kurdistanê jî dibin. Li Kurdistanê qonsolxane û nûnertiya wan heye. Li Silêmaniyê baregehên wan hene. Di şerê li dijî DAIŞê de gelek tesîra wan çêbû. Bi dehan fermandarên Îranî li herêmê hene.

**Li Silêmaniyê pirsgirêkên Parêzgeriyê hene, bi wekaletî tê îdarekirin. Gelo di vê rewşê de kî zirarê dibîne?**

Berê tenê di bin îdareya YNKê de bû û pirsgirêk derket. Dema ket destê Goranê dîsa pirsgirêk çêbûn. Di serî de gel zirarê ji vê yekê dibîne lê ev zirar dê bigihîje partiyan jî.

**Dê pêşeroja Nînova çawa bibe? Bi taybetî jî demografiya herêmê dê çawa bibe?**

Divê li Nînova ji bo Êzidiyan herêmek, ji bo Kirîstiyanan jî herêmeke din bê ava kirin. Kirîstiyan jî vê yekê dixwazin. Ez li Nînovayê avakirina dewletekê an jî hikûmetekê ji bo Kirîstiyanan dûr nabînim. Dema Yekîtiya Sowyetan belav bû 199 dewlet derketin holê. 3 dewletên Kirîstiyanan jî bêyî şer hatin ava kirin.

**Li gor we helwesta Tirkiye û Îranê li hember referandûma serxwebûnê dê çawa be?**

Em referandûmê ji bo nêrîna gelê xwe dikin, ne ji bo nêrîna dewletên din e. Di serî de em ê biryara xwe bidin, paşî em ê biçin dewletên cîran û deverên din. Em ê ji Tirkiye, Îran û dewletên cîran re vê yekê bêjin: Ev 26 sal e em wek Herêma Kurdistanê nîv serbixwe ne. Di vê dema dirêj de tu zirara me negêhişt we, em bûn sedema xêr û bereketê ji we re. Sedema bazirganiya di navbera me de hûn bi qezenc derketin. Em bi 25 dolaran neftê didin we, hûn bihatir difiroşin. Di bazarên me de karsaz û malên we hene. Bi sedan karsazên we hene li welatê me. Di warê tîcarî, ewlehî, siyasî û aboriyê de em bûn dostên we yên baş. A herî giring jî em ji bo ewlehiya we ya netewî nebûne talûke. Bi sedan karsaz û hemwelatiyên we tên welatê me û dibin xwedî kar. Em ê vê pirsê ji wan bikin; Eger em bibin dewleteke serbixwe ev li gor qezanca we ye an na?

### Dema Tirkiyê ji ber hebûna PKK li Şengalê bombebaran kir, Pêşmerge jî şehîd bûn. Hebûna PKKê li Şengalê çawa dibînin?

Kurd li ku dera cîhanê jî bin yek netew û yek welat e. Lê belê em bi peymana Sykes- Picotê ve bûn çar perçe û ev perçena di navbera Iraq,Tirkiye, Îran Suriyê de hat parvekirin. Em li Iraqê ne, PKK jî li Tirkiyê ye, hikûmeta me ya fermî li Iraqê heye, hêza me heye. Nabe ku hêzek ji perçeyekî din were û ji me re bibe pirsgirêk. PKK bo êrîşên DAİŞê ya Şengalê hatibû. Em jî bi daxwaza PYDê çûne Kobanê, lê dema ku bajar hat rizgarkirin em bê pirsgirêk vegeriyan. Me çek jî dan wan û xwîna xwe jî rijand. Em nabêjin, "Me bedelek daye û me venagerin." li wê derê baregeh çênakin û nabînin. Lê belê êdî DAİŞ li van deran tune ye. PKK çima naçe. Em hêviya vê yekê ne ku PKK bi awayekî aştiyane ji herêmê vekişe. Ne heqê me heye ku me tevlî meseleyên naxweyî yên dewletên din ne jî heqê PKKê heye ku bi awayekî leşkerî dest bavêje herêma me.



"Me di şerê li dijî DAIŞ'ê de gelek şehîd dan. Me di heman demê de jî ev peyam da welatên cîran û cîhanê: Îradeya miletê me DAIŞ şikand û eger hêzeke din derkeve holê û êrîşî me bike, bêguman em ê bersiva herî xurt bidin."



MURAD CÎWAN

## 378 Saliya dubeşbûna kurdistanê: Peymana qesra şêrîn II

Di 1623yan de Şah Abbas, Bexdad û derûdora wê jî ji destê osmaniyan derxist. Li ser vê, osmaniyan du caran sefer bir ser Bexdadê (1625-26 bi serdariya Hafiz Ahmed Paşa, 1629-30 bi serdariya Xusrew Paşa) lê biserneket. Cara sisiyê, di 1638an de, di bin fermandariya Sultan Muradê IVê de sefer çû ser Bexdadê, ew hat vegerandin.

Wê demê Şah Abbas miribû (1629), neviyê wî Şah Safî (Sam Mîrza) hatibû ser hukum.

Peymana Qesra Şêrîn piştî vê serkeftinê hat. Sultan Murad bi xwe zû vegeriya Îstanbulê, pirsa bestina peymanê bi Safewiyan re hişt ji wezîrê azam Kemankêş Mustafa Paşa re.

Di hemû van seferên ser Îranê de orduya osmanî bi piranî li Diyarbekirê, carina jî li Erziromê diciviya. Ji her eyaletê mîrêmîran, beg û paşa li gel eskerên xwe tevî seferê dibûn. Sefer carina li bakur, li alî Azerbaycanê, Rewanê û Şêrwanê, carina jî li başûr, li alî Şarezorê, Bexdadê û Besrayê bû. Di hemuyan de mîrên kurdan ên tabi'ê osmaniyan jî tevê dibûn. Li alî safewiyan jî mîrên derûdora Rewanê, Naxîçewanê, dora Urmiyê, Salmasê û Somayê tevî eskerên xwe li rex Şah cih digirt. Carina wan sef jî diguhert. Bi pirranî meyla wan li alî osmaniyan bû. Li başûr Erdelan di navbera herdu dewletan de parve bûbû. Mîrên wan geh li vî, geh li wî aliyî bûn. Loristanê hema hema bi temamî li alî Îranê sef wergirt.

Peymana Qesra Şêrîn

Peymana Qesra Şêrîn piştî ew qas pêlên çûyî û hatî yên şerên herdu dewletan û cara dawî bi zeftkirina Bexdadê ji bal osmaniyan ve hat mohrkirin. Sultan Murad bi xwe piştî serkeftinê zû vegeriya Îstanbulê, wezîrê azamê xwe hişt ji bo lihevkirinê.

Li alî Îranê, wekîlê Şah Safî Sarû Xan bû. Orduya Osmanî li deşta Zohabê danîbû. Sarû Xan tevî maiyeta xwe hat qerargeha orduya osmanî. Li alî osmaniyan, sadrezam û serdarê orduyê Kara Mustafa Paşa hebû. Peyman li xîveta Sadrazam hat îmzakirin, li dor sadrazam mîrêmîranên Kurdistanê û yên osmanî, rîspî û mezinên yeniçeriyan hebûn. Li gel Sarû Xan ê wekîlê Şah jî elçiyê destpêkê Mehemedqulî amade bû. Peyman ji bal sadrazam Kara Mustafa Paşa û Sarû Xan hat mohrkirin.

Sarû Xan doza vegerandina Kela Qersê kir, lê Sadrazam qebûl nekir. Piştî minaqeşeyên dijwar biryar wiha hat dan:

Ji eyaleta Bexdadê Hassan, Bedre, Mendelcîn (Mendelî), Derne, Derteng heta Sermenelê (Sermediyê), ew çolistanên ku di navbera wan de dimînin, qebîleyên Ziyauddîn û Harûnî yên eşîra Cafan, gundên li rojavayê Kela Zencîrê û çiyayên li rajora Kela Zalim-Elî ya nêzî Şarezorê; quntarên wan ên li vê keleyê nihêrtî, heta ku digihê geliyê ber bi Şarezorê ve vebûyî, Qizilce Qele û derûdorên bi ser wê ve ê ji bal padîşah[ê osmanî] ve bê zeft kirin. Ji bilî van, Axiska, Qers, Wan, Şarezor, Bexdad û Besra hemû kele, welat, nahiye, erd(erazî), çiya û girên di nav wan de, ê tu carî ji bal Şah ve tûşî êrîşê nebin. Û keleyên ji Mendelicinê (Mendeliyê) heta Dertengê, Bîre, Zezduvî (ku Zemrud Me'wa jî tê gotin) gund, kele, daristanên rojhilatê Kela Zencîrê û cihên ser bi wan ve, Mihriban (osmaniyan ji Merîwanê re digot. MC) û cihên ser bi wê ve ê di destê şah de bin. Osmanî ê dest nedin cihên nav wan deveran... Kela Zincîrê, keleyên Koturê û Makuyê yên ser hidûdê Wanê û keleya Magazberd ya li alî Qersê ê ji bal her du terefan ve bên hilweşandin...

Peymana mohrkirî merivekî elçiyê Şah Mehmedqulî girt da bigihîne Şah Safî ku ew wê mohr bike. Sê roj middet hat dayin. Di hundurê çar rojan de Şah Safî peyman mohr kir û ew vegeriya. Mehmedqulîyê elçiyê Şah ew girt da bibe Îstanbûlê ji bo morkirina Sultan Murade IVê.

Roja pêşî, Sedrazam ziyafeteka mezin da heyetên herdu aliyan. Roja duyê Sarû Xan ziyafeteka mezin da. Piştre Sarû Xan ber bi Şah ve birêket. Mehmedqulî berî orduyê berê xwe da Îstanbulê ba Sultan. Piştre orduyê jî dest bi vegerê kir.

Mehmedqulî di 19ê Îlona 1639an de gihaşt Îstanbulê, bi şertê ku li ser Bexdadê doza tu mafî neke, Rewan ji Şah re hat berdan û bi merasîmeka muezzem, Muradê IVê peyman mohr kir. Elçî ew girt û vegeriya welatê xwe.

Bi vî awayî Osmaniyan û Îraniyan ji 1514an bi vir de dawî li şerên wek pêlên med û cezîrê ên deryayê ên nêzî 125 salan anîn.

Li herdu aliyan jî serhedên van dewletan û qadên şerên wan, Kurdistan bû, li her du aliyan ew di bin piyên du orduyên gelek mezin de pêpes dibû, dihat talankirin.

Xan û mîrên Kurdistanê ji mecbûrî li herdu aliyan tevî orduyan dibûn, dihatin hemberê hev, gelek can û mal didan. Wek nimûne, di sefera 1625-26an a ser Bexdadê de ya bi serdariya Hafiz Ahmed Paşa, heft mîrên Kurdistanê beşdar bûbûn; Mîrê Hezoyê Şeref Xan, Mîrê Egilê Mu'mîn Xan, Mîrê Tercilê Îbrahîm Beg, Mîrê Paloyê Hesen Beg, Mîrê Erxeniyê Alî Begê Başibuyukzade, Mîrê Xarpêtê ÎbrahÎm Beg û Mîrê Îmadiyê Seyid Xan beşdar bûn.

### Sernivîskarê Raman Azad Abdulwahîd:

# Divê Kurd bi hizrên netewî binivîsin



MURAT ÖZDEMİR

Li Stenbolê 4ê Gulanê ji aliyê Yekitiya Kovarên Tirkiyê (TÜRDEB) û Yekitiya Kovaran a Cîhanê (World Periodical Union-WPU) 8. Fuara Kovaran a Navnetewî hat li dar xistin. Ji Herêma Kurdistanê jî ji paytext Hewlêrê 2, ji Silêmaniyê 1 û ji Duhokê jî 1 bi tevahî 4 nûnerên kovaran beşdarî vê fuarê bûn. Yek ji wan kovarên beşdar jî kovara Raman bû ku ev 12 sal e bê navber hewl û xebata xwe ya bo pêşdebirina çand û hunera Kurdî berdewam dike. Raman ku kovareke çandî, hunerî û wêjeyî ye û ji bo pêşdebirina çand, huner û wêjeya Kurdî xebatên gelek hêja kirin e. Raman sala 2005'an li paytexta Kurdistanê Hewlêrê dest bi weşanê kiriye û mehê carekê derdikeve. Gerînendeyê Giştî yê Ramanê Azad Abdulwahîd ku di heman demê de Cîgirê Serokê Yekitiya Nivîskarên Kurd e, Raman û xebatên xwe ji Basê re vegotin.

Azad Abdulwahîd, radigihîne cara yekem e ku beşdarî fuareke navnetewî li Stenbolê dibin û wiha pê de diçe: "Me di vê fuarê de derfeteke baş dît ku kovara xwe bidin nasîn. Beriya niha em li Îran û welatên din beşdarî fuaran bûn. Ji bo xwînerên Tirkîaxêf jî di derbarê kovara me de bibin xwedî zanyarî, me danasîna xwe bi zimanên Tirkî û Îngîlîzî jî kir. Di vê fuarê de ji gelek welatan kovaran cih girtin."

**"Divê li ser yek alfabeyê biryar bê dayîn"**

Azad Abdulwahîd destnîşan dike ku kêşe û dezavantaja herî mezin ya Kurdî, hebûn û bikaranîna du alfabeyan e û wiha dewam dike: "Hebûna du alfabeyên ji hev cuda ji bo Kurdî handîkapeke mezin e. Divê zimanzanên Kurd li ser vê meselê rawestin û li ser yek alfabê biryar bê dayîn. Ji ber wê yekê divê zimanzan di kongreyeke giştî de û bi perspektîfeke netewî vê meseleyê çareser bikin. Bi riya televîzyon, rojname û wêjeyê, herdu zaraveyên Kurdî Kurmancî û Soranî nêzî hevdu bibin û diwarên ku ji berê û vir ve di navbera herdu zaravayan de hatine avakirin bên hilweşandin. Bi rêya ragihandinê zaravayên Kurdî nêzî hevdu dibin, lêbelê ev têr nake û divê ev mesele bi awayekî berfireh û bi rêk û pêk were gotûbêjkirin û biryar bên standin.

**"Raman, di şertên awarte de derket"**

Abdulwahîd dibêje ku Raman di şert û mercên gelek dijwar de derket û radigihîne: "Dema ku Raman derket, qedexe bû ku têkeve Silêmaniyê, bi awayekî veşartî û nehênî dihat xwendin. Dema ku rewşa siyasî asayî bû, me dît ku li Rojava û Bakurê Kurdistanê gelek nivîskarên serkeftî yên ku bi Kurmancî dinivîsin hene . Pirsgirêkeke me heye ku mixabin xelkê me yê Rojhilat û Başûrê Kurdistanê van nivîskaran nas nakin û nizanin. Ji ber wê yekê ji bo ku xelkê me yê herdu parçeyan jî van nivîskaran nas bikin, me nivîsarên wan bi alfabeya erebî belavkirin. Projeyên me hene ku em kovara xwe bi Kumancî û bi latînî derxin, lê niha ev yek ne pêkan e. Rewşa darayî jî carînan li pêşiya van projeyan dibin asteng. Divê xebatkar û butçeyeke me hebe ku em van projeyan bicî bikin û ji ber wê yekê niha ew derfet di destê me de nîn in."



**"Nivîskar û edîbên Kurd bo zimanê xwe zêde hewl nedan"**

Abdulwahîd dibêje, nivîskar û edîbên Kurd bo zimanê xwe hewleke zêde nîşan nedan û axaftina xwe wiha didomîne: "Di sala 1970'an de ji bo çareserkirina kêşeyên akademîk yên zimanê Kurdî li Bexdayê Akademiya Zanistî ya Kurdî hatibû damezrandin. Ew kesên di nava vê akademiyê de dihatin rexnekirin ku kêşeyên felsefî, rexneyî, zanistî yên zimên venegotine û zêde li ser nesekinîn e. Em wek kovara Ramanê me bal kişand ser kêmasî, şaşî û kêşeyên ziman yên ku ji 1920'an û ve hene û me ji van şaşiyan ders girtin û hewl da ku dubare nekin. Divê Akademiya Zanistî ya girêdayî Lijneya Wezîran ji bo ziman kom bibe. Divê di hemû sazî û dezgehên Kurdî de zimanekî standart were bicihkirin. ""Hebûna dezgehên wek Basê ji bo ziman girîng e"

Azad Abdulwahît radigihîne ku hebûna dezgehên ragihandinê yên wek Basê, ji bo ziman gelek girîng e û pê de diçe: "Kêşeya me ew e ku me bi Faris, Ereb û Tirkan re diyalogeke baş, ava nekir. Bi riya dezgehên wek Basê dibe ku bi Kurdên Tirkiyê re jî diyalogên baş bên pêşdebirin. Siyaset û projeyên Kurdistanê, li derve zêde nayên zanîn divê ev bên vegotin û ji bo mixatabên me, me fêm bikin û em hevdu têbigihin, hebûna dezgehên wek Basê ku bi Kurmancî-Tirkî weşanê dikin û Kurdistanê vedibêjin, gelek girîng in."



## "Divê hemû nivîskar piştevaniya projeya serxwebûnê ya Serok Barzanî bikin"

Azad Abdulwahîd axaftina xwe wiha berdewam dike: "Daxwaza min ew e ku divê hemû nivîskar û xebatkar, pişteveniya projeya serxwebûnê ya Birêz Serok Barzanî bikin. Ev girîng e ji ber ku Serok Barzanî ji bo serxwebûna Kurdistanê û ji bo ku miletê Kurd bigihije armanca xwe hewld dide û tevdigere. Hewldanên Serok Barzanî hemû ji bo doza netewî ya miletê Kurd in. Ji ber wê yekê ez piştevaniya Serok Barzanî weke pêdivî û zarûriyekê dibînim. Nivîskarên Kurd jî bi berhemên xwe dikarin piştevaniya Serok Barzanî û van hewldanan bikin. Nivîskarên Kurd yên ku ne bi Kurdî jî dinîvisin divê vê yekê li ber çavan bigirin. Mînak; Nivîskarê Kurd Selîm Berekat bi zimanê Erebî dinivîsîne, lêbelê nasname, doz û meseleya Kurdan ji cîhanê re dide danasîn. Vegotina meseleyên miletan bi huner û wêjeyê jî gelekî girîng e. Em miletan bi rêya nivîskar û hunermendên wan nas dikin û kêşe û meselyên wan bi rêya nivîskaran dizanin. Nivîskar her demê bi vegotina kêşe û meseleyên miletên xwe mezin bûne. Em ê di her rewş û mercê de bi berhemên xwe piştevaniya serxwebûnê û doza miletê Kurd bikin. Ji bo miletê me jî pêşketin û geşepêdana nivîs, çand û hunerê dê ne di bin siya çekan de, di demên azadî û aştiyê de zêdetir pêş bikeve.

### Azad Abdulwahîd kî ye?

Gerînendeyê Giştî yê Kovara Raman û Cîgirê Serokê Yekitiya Nivîskarên Kurd Azad Abdulwahîd, zêdetirî 30 pirtûk nivîsandine û di heman demê de pirtûkên wî yên rexneyî û werger jî hene.

## "Di warê çand û ziman de geşepêdanek girîng heye"

Herwiha Azad Abdulwahîd dibêje, geşepêdan û pêşketina di warê ziman, çand û hunerê de girêdayî rewşa siyasî ye û diyar dike: "Li Başûrê Kurdistan di warê ziman, wêje, çand û hunerê de xebat û pêşketineke mezin û girîng heye. Ji ber ku Kurd li vî parçeyê Kurdistanê azad in û qedexe, zext û zordarî li ser zimanê wan nîn e. Li Rojhilatê Kurdistanê potansiyeleke mezin heye, daxwaz û helwdaneke zêde heye, lêbelê azadiya çapemeniyê heye û xebatên ji bo pêşdebirina zimanê Kurdî qedexe ne. Em di kovar û rojnameyên xwe de hindî ku ji me tê em hewl didin cih bidin Rojhilatê Kurdistanê. Ji xwe gelek hunermend, nivîskar û sînameger karê xebatên xwe li Başûrê Kurdistanê pêk tînin. Ji Rojavayê Kurdistanê jî nivîskarên wek Fawaz Husên û Jan Dost hene û wek tê zanîn rewşa wê derê li holê ye. Li Bakurê Kurdistanê jî gelek nivîskar û hunermendên serkeftî hene, lêbelê mixabin belav bûne. Divê saziyên ku van hemûyan li bin sîwana xwe kom dike bên avakirin û sûdê ji Başûrê Kurdistanê wergirin. Hemû tişt girêdayî siyasetê ye. Carînan nivîskar dixwazin kom bibin, lêbelê rewşa siyasî dibe asteng. Ji ber wê yekê divê nivîskarên Kurd bi hişmendiyeke netewî binivîsin û tevbigerin. Divê hewl û xebata wan ji bo hişyarkirin û belavkirina netewperweriyê be. Ew kesên ku li dijî daxwazên netewî siyasetê û wêje û tevdigerin, bi ser nakevin."

## Beriya referandûmê

# Parlamento çalak dibe

HÊMIN SALIH



**HIKÛMETA** Kurdistanê ku biryara pêkanîna referandûma serxwebûna Kurdistanê daye, amadekariyên çalakkirina parlamentoyê dike. PDK û YNK di wê baweriyê de ye ku beriya pêkanîna referandûma serxwebûnê, çalakkirina parlamentoya Kurdistanê wê gaveke girîng be.

Ji Hikûmeta Kurdistanê çavkaniyek radigihîne ku li gor rêkeftina PDK û YNK'ê a ji bo referandûmê, herdu alî jî daxwaza çalakkirina parlamentoyê dikin. Li gor vê yekê; PDK, YNK, yên bo kote hatine veqetandin û endamên ji partiyên din, li gorî benda 22. a rêziknameya parlamentoyê bi 50+1'an hejmar zêde a di parlamentoyê de bidest bixin û dikarin bi vî awayî bi rengekî yasayî parlamentoyê kom bikin. Serok û cîgirên serok yên parlamentoyê beşdar nebin jî, bi piraniya dengan, li gor benda 16. a rêziknameya parlamentoyê, endamê herî pîr wê serokatiya parlamentoyê bike.

Parlamenterê PDK'ê û Endamê Lîsteya Hiqûqê yê Parlamentoya Kurdistanê Şivan Ehmed, ragihand ku PDK û YNK li ser mijara referandûmê kom bûn û bêyî ku li benda tijîbûna maweya kanunî bimînin, li ser çalakkirina parlamentoyê li hev kirin. Parlamenterekî PDK'ê jî diyar kir: "Hewldanên me bo wê yekê ne ku bi beşdarbûna hemû aliyan parlamento bê aktîvkirin. Meseleya referandûmê jêveneger e. Ya girîng ew e ku beriya referandûmê, parlamento bê çalakkirin. Dibe ku komîsyona bo referandûmê ji aliyê parlamentoyê ve bê destnîşankirin ku hin alî vê yekê dixwazin. Lêbelê eger dîsa jî parlamento neyê aktîvkirin, ev li pêşiya referandûma serxwebûnê nabe asteng."

Çavkaniyeke ji Hikûmeta Kurditanê jî di derbarê meseleya çalakkirina parlamentoyê de wiha axivî: "Civîna yekem a parlamentoyê, wê referandûma serxwebûna Kurdistanê û avakirina Komîsyona Bilind a Hilbijartinan a Serbixwe be. Eger alî li hev bikin, civîna duyem, taybet wê li ser hilbijartinan be. PDK û YNK di mijara vegûhastina hilbijartinan ji lîsteya vekirî û bo lîsteya girtî di heman nêrînê de ne. Bi vî awayî li şûna girseya partiyên siyasî û kesên navdar lêbelê bêtecrube, wê namzetên pispor û di warên xwe de têr û tijî bo parlamentoyê bên nîşandin. YNK'ê mijara civîneke hevbeş bi Goranê re gotûbêj kir, lêbelê Goranê bersiveke teqez nedaye. Hin berpirsên Goranê di derbarê guhertina serokatiya parlamentoyê de biryara pêkanîna bi yek paketê dabû. Gelek alî, rewşa xerab a parlamentoyê bi têketina hilbijartinan bi lîsteyên vekirî ve girêdidin. Ji ber wê yekê em lîsteyên girtî baştir dibînin. Eger ev mijar jî bê gotûbêjkirin wê baş be."

### "Em bi Goranê re gotûbêj dikin"

Endamê Serokatiya YNK'ê û Serokê Fraksiyona YNK'ê Bêgerd Talebanî, li ser vê mijarê ji Basê re ev nirxandin kirin: "Me wek YNK, ji bo çalakkirina parlamentoyê pêşniyazeke yasayî amade kiriye û em vê meselê bi PDK û Goranê re gotûbêj dikin. Em lihevhatineke li ser vê meselê di navbera hemû aliyan de girîng û pêwîst dibînin. Talebanî, eşkere kir ku ew dixwazin beriya pêkanîna referandûmê, parlamento bê aktîvkirin û referandûm jî bi awayekî yasayî pêk were."

Endama Lijneya Giştî yê Tevgera Goranê û Endama Komîsyona Yasa yê Parlamentoya Kurdistanê Behar Mehmûd jî ev tişt gotin: "Nêrîna me ya di derbarê çalakkirina parlamentoyê û guhertina serokê parlamentoyê de neguherî ye. Divê guhertinên werin kirin, bi pakêtekê werin bicîkirin. Di rêziknameya parlamentoya Kurdistanê de qala tayînkirina kesekê li şûna serokê parlamentoyê yê ku îstîfa nekiriye, nayê kirin."






Karîkator ---------- Dijwar Ibrahim



HOŞENG OSÊ

## YNK, PKK û "qantona" Sulêmaniye-2

Di sala 2000î de û piştî ku PKKê li gorî biryara Öcalan, hêzên xwe yên leşkerî ji bakur vekişandin û "grûbên aştiyê" şandin Tirkiye û dest bi pêvajoya aştiyê bi Enqerê re hat kirin, hêza leşkerî a PKKê li başûrê Kurdistanê zêde bû û di nava vê hêzê de, gelek berpirs û şervan ji pêvajoyê û guhertina PKKê û biryarên Öcalan ne razî bû û pêwîstî bi şerekî hebû da ku şervan bi tiştekî din werine mijûl kirin û hinek kes di vî şerî de werin "tasfiye" kirin. Lewma PKKê di payîza 2000î de êrîşî YNKê kir û di vî şerî de, bi kêmanî, ji 400 heta 500 şervanên PKKê û du qatên wan ji aliyê YNKê jî jiyana xwe ji dest dan û ev êrîş têk çû. Ango, hema PKKê dest bi aştiyê bi Tirkan kir, di cih de êrîşî YNKê kir.

Wê çaxê, ango di 17.01.2000î de, rojnameya Ereb a navdar "El-Hayat" di rûpela 2 ji hejmara 13460 de daxuyaniyek Celal Talabanî belav kir û tê de dibêje: "PKKê nankor e û bê wefa ye. Weke YNKê, me gelek êş û jan ji bo PKKê kişandiye lê PKKê rêzê li peymanek ji peymanên ku bi me re mor kiriye, nagire. Gerek PKKê here herêma xwe, şer dike, aştiyê dike, bi kêfa xwe ye. Lê ne ku li Kurdistana Tirkiyê aştiyê bike û li Kurdistana Iraqê şer bi me re bike". Di eynî nûçeya "El-Hayatê" de PKK jî, li ser zimanê Osman Öcalan ku wê çaxê berpirsê rêxistinê bû, YNKê bi dijatiya PKKê tawanbar kir û got ku ji bo vê yekê; "YNKê ji PDKê 80 milyon dolar stendiye".

Rojnama "El-Hayatê" di rûpela xwe a 1ê ji hejmara 13832 roja 27.01.2001ê de nûçeye belav kiriye, têde rexneyên tund yên Abdullah Öcalan li Celal Talabanî hene û dibêje: "Peymana ku serokê YNKê Celal Talabanî bi Enqerê re mor kiriye, dê bibe serdema şer li bakurê Iraqê û dê şer bigihêje Tirkiyê jî". "El-Hayat" di nûçeya xwe de dibîne ku "rexne û daxuyaniya Öcalan, bersiva daxuyaneke hevbeş a YNKê û PDKê derxistine û têde PKKê weke rêxistineke terorê tê bi nav kirin".

Lê niha jî, di 2017an de, YNKê hebûna PKKê li Şingalê û tevahiya Kurdistana Başûr rewa dibîne û Suleymaniyê kiriye qantonek ji qantonên PKKê.

Di sala 2004an de dema alozî û pirsgirêk di navbera baskê Osman Öcalan û baskê Cemîl Bayık de çê bû, YNKê piştgiriya perçebûna di nav PKKê de kir û hemû kesên ji PKKê û PYDê veqetiyan hembêz kir û desteka aborî, ragihandin, parastin û ewlekirin da wan, lê tevlî wisa jî PKKê karibû xwe bigihîne Kanî Yılmaz (Faysal Dunlayıcı 1950-2006) û di 11.02.2006an de bikuj e. Her wisa dikarî bû xwe bigihîne Kemal Şahîn ku berpirsê PYDê bû û wî jî di 17.03.2005an de û Suleymaniyê bikuj e.

Piştî serhildan û şoreşa gel li dijî rêjîma Beşar Esad di buhara 2011an de rûda bi çend heyvan, têkiliyên di navbera PKKê û YNKê de ji nû ve germ bûn. Helbet sedem naskirîne ku herdû partî "hevalbendên" rêjîmên Tehran û Şamê ne, lê ew weke alav têne bikaranîn. Jixwe piştî rêjîma Esad beşe ji rêvebirina rojavayê Kurdistanê di 19 tîrmeha 2013an de PKK-PYD-YPGê, ku PYDê navê wê kiriye "şoreşa rojava", wê çaxê peywendiya di navbera YNKê û PKKê de hema bû şîr û şekir, yan jî bû dims û hingiv û rûnê helandî.

Bi rastî, pêwîstî bi ewqas şiroveyên kûr û dûr nîne da ku em rastiya çiroka ev "eşq û evîna" di navbera PKKê û YNKê de nas bikin ku her aliyek ji wî heye aliyê din dixapîne û ji bo berjewendiyên xwe bikar tîne. Ango, PKK-YNKê dikarin hemû kîn û dijatiyên xwe deynin aliyekî û pêkve di dijatiya PDKê de bighêjin hev.

De werin binerin bê Cemîl Bayık çi li ser Talabanî û YNKê dibêje: "Ji bo çi Talebanî dijatiya serokê me (Öcalan) dikir? Gerek em vê mijarê baş têbighêjin. Piştî peymana Cezayirê û têkçûna tevgera Barzanî sala 1975an, Talabanî vê rewşê weke "fersend" dît da rêxistina xwe li Kurdistanê xurt bike û tola xwe ji Barzanî hilbigire, ji ber ku PDKe û Barzanî nehiştin rêxistina Talabanî li Kurdistanê belav bibe. Û ji bo ku Talabanî PDKê û Barzanî têk bibe, ne bes li Kurdistana Başûr xwest rêxistina xwe bi cih bike, lê xwe li Kurdistana Bakur jî wisa bike. Tu rê li pêşiya wî nîne, nemaze piştî ku PDKê di 1975an de xwe li bakur bi cih kir. Lewam bakur ji bo Talabanî gelek girîng bû. Berî ku Talabanî deshilatiya xwe li ser bakur ferz bike û berî ku PDkê dorpêç bike û têk bibe û Talabanî xwe weke qral û padîşahê Kurdistanê îlan bike, tevgera me derket. Ango derketina PKKê hemû hesab, plan û armancên Talabanî têk birin. Lewma Talabanî hema fersenda dijatiya serok (Apo) û PKKê di kur de bibîne, dê bike. Ji ber ku Talabanî dibîne ku Apo û PKKê nehiştin ku YNKê heyf û tola xwe ji PDKê û Barzanî bistîne û Talabanî bibe qralê Kurdistanê. Ev jî rast e. her ku tevgera me pêş dikeve, partiya Talabanî têk diçe".

## Hilbijartinên Îranê:

# Di 38 salan de 'Komara Îslamî'



ESKENDER CEIFERÎ





Ji sala 1979'an ve heya niha 12 gerrên hilbijartinên serokkomariyê li Îranê hatine encamdan. Di ti yek ji wan de ti Kurdekî nekarî bibe berendam. Belkî sedemek ji hêncetên baykotkeran jî her ev e. Di 11 gerran de heft kes weke serokkomar hatibûn hilbijartin. Helbet desthilata wan sînordar e û nikarin tişteki bêjin ku li gora heza Elî Xamineyî rêberê Komara Îslamî nebe.

Di salên di navbera 1979'an de heya 1981'an du kesên bi navên Ebulhesen Benîsedr û Mihemedelî Recayî serokkomar bûn. Lê serokkomariya her duyan jî netemam ma. Sala 1981'an take sal bû ku du caran li wî welatî hilbijartinên serokkomariyê hatin encamdan. Sedem jî kuştina Mihemedelî Recayî bû ku tenê kêmtirî mehekê di wê postê de bû.

Piştî kuştina Recayî, Elî Xamineyî, Ekber Haşimî Refsencanî, seyîd Mihemed Xatemî û Mehmûd Ehmedînijad her yek du salan serokkomar bûn. Tevî ku serokkomar li wî welatî piştî bidawîhatina dema çar salên xwe, car din bi hikûmetê re dimîne, lê Refsencanî û Ehmedînijad du ji wan kesan bûn ku piştî çend salan car din xwastin bibin namzed lê selahiyeta wan hate redkirin.

Di hilbijarinên sala 2009'an de zêdetirîn asta beşdariya xelkê ji aliyê wezareta Navxwe ve hatiye tomarkirin. Mehmûd Ehmedînijad wê demê karîbû tundrewan bikşîne aliyê xwe ve. Mîrhusên Mûsewî jî ku reformxwaz bû, karîbû bi hildana sloganên demokrasiyê, gelek dengan bi dest xwe ve bîne. Lê pişt re wezareta Navxwe ragihand ku navê Ehmedînijad car din ji sindûqan derketiye. Di wan hilbijartinan de zêdetirî 39 milyon û 400 hezar kesan deng dan ku dike ji sedî 84 kesên ku mafên dengdanê hebûn.

Di van 38 salan de gerra duyem ya serkeftina Refsencanî, xwediya kêmtirîn asta beşdariya xelkê di proseya dengdanê de bû. Di wan hilbijartinan de hinek zêdetirî 50 ji sedî kesên ku dikarîn deng bidin, dengên xwe bikaranîn.

Di destpêka avakirina Komara Îslamî de di yekemîn gerra hilbijartinan de 124 kesan navên xwe weke berendam tomar kirin ku piştî dayîna selahiyetan û vekişîna hin berendaman, 96 kesan hevrikî kir. Di hilbijartina herî dawî ya 2017'an de 1636 kesan navên xwe ji bo wergirtina selahiyetê tomar kirin lê di encamê de tenê selahiyet ji 6 kesan re hate dayîn.

Gelek kesan tevî ku pêgeheke baş di nava xelkê de hebûn, lê nikarîn selahiyetê bistînin. Yek ji wan ku heya niha jî çarenivîsa wî nayê zanîn, Mesûd Recewî rêberê rêxistina Mucahidên li Tehranê bû.Wî deng neda yasaya bingehîn û ji ber vê, Rûhulla Xumeynî got ew kafir e. Xumeynî li ser serkirdeyên Kurdan weke Dr. Ebdulrehman Qasimlû jî heman tişt got tevî ku di civaka Kurdistanê de xwediyê pêgeheke bilind bû.

Ebulhesen Benîsedir jî ku 78 ji sedî dengan bi dest xistibûn, ji aliyê parlamentoyê ve di bin givaşên Xumeynî de hate dûrxistin û niha li Fransayê ye. Tevî ku Benîsedr di şerê li dijî Kurdan de li pişta Xumeynî bû, lê di şerê Îran û Îraqê de pişta Xumeynî negirt û ev jî bû sedema dûrxistina wî ji posta serokkomariyê.

Sadiq Qutbzade ku wezîrê derve bû bi tometa hewldan ji bo derbeya leşkerî hate darvekirin. Daryûş Firûher wezîrê Karûbarên Civakî bû, hate kuştin. Herduyan jî dixwast bibin berendamên serokkomariya Îranê.

Mîrhusên Mûsewî û Mehdî Kerûbî jî ku di hilbijartinên sala 2009'an de berendam bûn û beriya wê jî çend postên bilind di hikûmetê de hebûn, nekarîn bi ser Ehmedînijad de serkevin. Mûsewî û Kerûbîner-azîbûna xwe ji encamên dengan anîn ziman û alîgirên wan derketin kolanan û xwepêşandan kirin. Tevlîhevî çêbûn û ji wê demê ve ew di malên xwe de girtî ne.

Kurd dibêjin eger Dr. Ebdulrehman Qasimlû serkirdeyê Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê û Fuad Mistefa Sultanî serkirdeyê Komelê bikariya mafê xweseriyê ji bo Kurdan ji Tehranê bistînin berî ku bêne terorkirin, dikarîbûn bibin namzedên serokkomariya Îranê jî. Ew dibêjin Komara Îslamî hewl dide hemû hêzên opozîsyonê, dijberên xwe û serkirdeyên wan jinav bibe. Fuad Mistefa Sultanî sala 1979'an li nêzîkî gundê Bestam li ser riya di navbera Bane û Merîwanê de hate terorkirin. Dr. Qasimlû jî sala 1989'an li Wiyena paytexta Austria ji aliyê terorîstên Îranê ve hate terorkirin.



# Şikefta Seholan li Mehabadê



Şikefta Seholanê dikeve 35 kîlometriya riya di navbera Mehabad-Bokanê de. Her hemû torîst û serdanker jî, eger bi dehan caran serdana Seholanê bikin dîsa jî jê têr nabin. Matmayî dibin û li derdoran dinêrin. Her sal hezaran kes serdana wê şikeftê dikin.

Seholan bi Soranî tê wateya bûzê. Dîwarên wê tev ji kevirên mîna bûzê ne.

Erdê şikefta Seholan ji gelek kaniyên biçûk û mezin pêk hatiye. Dalan û riyên biçûk û mezin jî di dîwarên şikeftê de hene ku ger bi belemê bikarî derbas bibî yan jî bi avjeniyê, hemû digêjine hev. Kaniya herî dawiyê, bi qasî 50 metran serê xwe daye bin banê şikeftê. Kûrahiya avê di kaniya navîn de digihêje 35 metran. 46 sal beriya niha şandeyeke zanîngeha Aksfordê serdana Seholanê kir û ragihandin ku ew şikeft, ji bêmînaktirîn şikeftên cîhanê ye. Wan di raporekê de di vê derbarê de matmayîna xwe anîbûn ziman. Sala 1990'î jî hejmareke lokîneran ji bo naskirina zêdetir, serdana Seholana Mehabadê kirin. Wan karîn derî û riyên nû di nav şikeftê de bibînim. Vedîtina wan riyan jî bû sedem ku zêdetir girîngî bi Seholanê bê dayîn. Sala 1996'an ew deriyên kevirîn hatin dîtin û di sala 1999'an de jî şaredariya Mehabadê biryar da hemû deriyan ji bo serdana torîst û serdankeran bikar bîne. Li gora ku saziya çandî ya şaredariya wî bajarî dibêje, her sal herî kêm 200 hezar torîst serdana şikeftê dikin.

Şikefta Seholanê gelek dişubhe şikefta Elîsedr li Hemedanê. Cudahiyeke herî berçav di navbera wan du şikeftan de heye ew jî ev e ku qendîk angu kevirên bûzê tevahiya derdora dîwaran û banê şikeftê di nav de nixumandiye. Ger pêçandina şikeftê bi bûzê nebûya, nava şikeftê ewqasî sar nedibû. Lê ev di demekê de ye ku heya niha tevahiya cihên şikefta Seholanê nehatine dîtin.

Piştî ku mirov derbasî nav şikeftê dibe û riyeke kin bi piyan derbas dike, pişt re bi beleman dikare di ser avê re derbasî nav riyên cuda yên şikeftê bibe. Ji wan keviran, mînakên ku dişubhin ajalan çêbûne. Piyê fîl, bûka deryayê û kevokên xweşik ji wan keviran xuya ne. Weke ku mirov wan keviran bi destên xwe çêke, bedewî tê de reng vedide. Di dîwarên şikeftê de ji xeynî nexş û nîgarên ajalan, hin nexş û nîgarên efsaneyî jî hene.

Kevokên taybet û perçemk angu şevşevok, take rûniştvanên şikeftê ne. Ew nolê mişkan in, lê perên wan hene û dikanin bifirin. Dema mirov bi beleman derbas dibe, ronahiya derdorê nahêle perçemk li wir bimînin ji ber ku ew ji ronahiyê hez nakin û berên xwe didin dalanên tarîtir. Ew di dalanan de li ser hêkên xwe rûdinin. Lê kevokên xweşik jî di şikeftê de hene ku berdewam tên û diçin.

Riya derveyî şikeftê jî, ji bandora enerjiya nava şikeftê bêpar nemaye. Li gor yasayên Niyoton û fîzîkê, otombêl divê bi dijwarî bikarîn herin ser çiya. Lê li Seholanê ne fîzîk naskirî ye ne jî Niyoton. Ji ber ku otombêl bi hêsanî serdikeve û bi dijwarî vedigere quntara çiya. Çiya jî dikeve ser riya Burhanê ku weke navçeyeke xwediyê xwezayeke xweşik naskirî ye.

Ev çend sal in ku saziya Jîngeyê ya dewletê li parêzgeha Urmiyê biryara parastina navçeyê daye. Lê li hora pêwîstiyê girîngî bi wir nehatiye dayîn. Bûdce jî ji aliyê wezareta navxwe ve radestî qayinqametiya Mehabadê û saziya Jînge hatiye kirin lê ji ber sedemên nediyar ji bo vî karî nehatiye xerckirin. Tevî vê çalakvanên Mehabadî dibêjin diviyabû pereyên ku ji torîstan têne standin, ji bo avedankirina navçeyê û pêşxistinê bihata xerckirin. Lê ew jî xuya nîn e diçe kuderê!

# Heftiyek mafên mirovan li Rojhilatê Kurdistanê

Serê sibeha roja 14.05.2017'an, nêzîkî gundê Tete li navçeyeke derdora bajarê Merîwanê di vergerîna wesayîteke kolberan de ku ji ber êrîşa hêzên sersînor direviyan, du kolberan jiyana xwe ji dest dan û du kolber jî birîndar bûn. Kolberên ku jiyana xwe ji dest dane, Hadî Şîrwanî Selt û Îdrîs Muradî Xîzandar xelkê gundê Bilçesûr yê navçeya Komasî û Serşîwê ne. Du kolberên birîndar jî li nexweşxaneya Merîwanê di bin çavdêriya bijîşkî de ne.

Li Şinoyê jî êrîşî ser kolberan hate kirin û 14 hespên wan hatin kuştin.

Li devera sînorî ya Hewramana Rojhilat li nêzîkî nahiya Biyareya Helebcê ku tam li ser sînorê di navbera Rojhilat û Başûrê Kurdistanê de ye, pasdarên Îranê êrîşî ser kolberên Kurd kirin û kolberan jî bersiv dan êrîşên wan û di encamê de herî kêm 2 pasdar birîndar bûn ku yek ji wan fermanderekî mezin e.

Di encama şer û pevçûna di navbera malbetekê de, keseki xelkê Selmasê heft kes ji endamên malbata xezûrê xwe ku di nav de jin û zarok jî hebûn, kuştin. Êrîşkar hatiye girtin û di derbarê bûyerê de lêpirsîn pê re tê kirin.

Dewleta Îranê ji xwepêşandanan ditirse û ji du rojan berî encamdana hilbijartinan çekdarên xwe yên ku ji Kurdan pêk tê û weke Besîc têne binavkirin, li qadên nêzîkî cihên dengdanê li bajarên Rojhilatê Kurdistanê bicî kirin. Sedem jî rêgirtin ji lidarxistina xwepêşandanan û lihemberderketina hêzên Kurdî ye eger êrîşê bikin ser wan.

Çalakvanên sivîl yên Yarsan li Kirmaşan û Îlamê dibêjin berbijêriya 28 Yarsaniyan ji bo hilbijartinên civatên gund û bajarên wan du parêzgehan hatine redkirin. Siyaweş Heyatî çalakvanê Yarsan jî dibêje di heyama hilbijartinên serokkomariya Îranê de gelek Kurdên Yarsanî rastî lêpirsînê hatine.

Bîmeyên tendirustiyê û yên erd û xaniyan li Rojhilat, ziyanên welatiyan ji wan re qerebû nakin. Li bajarên Kurdan weke Urmiye, Şino û Seqizê, nêzîkî mehek beriya niha di encama rabûna lehiyê de gelek kesan jiyana xwe ji dest dan û ziyaneke mezin çêbibû lê heta niha ti pereyek weke qerebû ji wan re nehatiye dayîn. Herwisa gelek rê û pir rastî ziyanê hatibûn ku tenê hejmareke kêm ji wan dîsa hatine nûjenkirin.





Girtiyekî Kurd li Selmasê bi navê Nezmîn Heyderî 40 salî ku bi girtina hertimî hatiye mehkûmkirin, car din rê nehate dayîn bi danîna kefaletê serdana malbatê bike. Nezmîn Heyderî bi tometa endametî di partiyên Kurdî de bi hebsa hertimî hatiye cezadan. Beriya niha jê re hatibû ragihandin eger bikare pereyekî zêde bide, wê hukmê wî bê hilweşandin. Lê ji ber ku pere tine bû ku bertîlan bide, hukmê girtina wî nehate guhertin.

Li girtîgeha Dîzêlawa ya Kirmaşanê biryarên darvekirina 25 welatiyan ji bo bicîkirinê hatine rasipartin. Ew girtî ku Navenda Demokrasî û Mafên Mirovên Kurdistanê navên wan belav kiriye, bi tometên weke kuştinê û bazirganîkirin bi madeyên hişber bi darvekirinê hatine mehkûmkirin.

Endîşmend Yezdanî xelkê Gamêşgoliya Miyandowê bi du salan girtinê û dayîna milyonek û 300 hezar Tumen pere hate cezadan. Li Şinoyê Farûq Şarwêranî hate girtin. Du welatî ji aliyê polîsên çalakiyên înternetê ve li Kirmaşan û Sine hatin girtin. Qasim Abiste girtiyê Kurd li Recayîşarê ji bo ku çareseriya bijîşkî jê re bê kirin, kete gireva birçîbûnê. Sedemên hukmdana wan kesan, alîkariya partiyên Kurdî û dijberiya Komara Îslamî ye.

## Di edebiyata Kurdî de

# Çavkaniyên edebî yên edebiyata klasîk



NURULLAH ALKAÇ

**CUDAHIYÊN** di navbera zaravayên Kurdî de, ji ber bingeha eşîrtiyê ji serdemên 8. ta 15. di çavkaniyên Erebî de derdikevin pêş çavan. Yekem car zaravayên Kurdî ji aliyê Şerefxanê Bêdlîsî di sedsala 16. de hatine dabeşkirin. Kurdî ji 5 zaravayan pêk tê. Ew jî: " Kurmancî, Soranî, Goranî, Kirmanckî/Zazakî û Lorî" ne. Heta niha di tu xebatên edebî de têgeha 'Wêjeya Kurdî' bi giştî nehatiye bikaranîn. Bi taybetî jî çavkaniyên di hemû zarava û baweriyan de hene (Êzidî, Yaresan, Elewî, Şîa, Sûne, Cihû) nehatine bikaranîn.

Di wêjeya Erebî de ji berhemên 'Ji bo jiyan û berhemên helbestvanan' hatine amadekirin re 'Tabakat' tê gotin. Di Farisî, Tirkî û Urdu de jî 'Tezkîre' tê gotin. 'Helbestên bijarte' jî bi navê 'Mecmua' bikaranîne. Heta niha di wêjeya Kurdî de mirov rastî tu tezkîreyan nehatibe jî berhemên ku hemû helbestan di xwe de dihewîne hene. Navên berhemên ji sedsala 10. heta salên 1950'î hatine bikaranîn ev in: 'Defter', 'Keşkûl', 'Mecmua', 'Rîsale'.

**Defter:**

Çend mînakên ji Defterê ev in: "Serencam, Dewrey Balûl, Defterî Pîrdîwarî, Defterî Diwanî Gewre, Defterî Sawa, Defterî Ramyaw, Defterî Zulal Zulal, Defterî Gewahî Xulaman, Defterî Şindirwe, Defterî Abîdînî Caf, Kelamî Almas Xan, Kelamî Derwêş Kulî Kirindi, Dewrey Qırmizî, Kelamî Zulfîkar, Dîwanî Şa Teymûr Banî Yaranî, Dîwanî Kasîd, Dîwanî Şah Amîr, Kelamî Newroz" ku di sedala 8. heta sedsala 20. gelek berhemên bi zaravayê Goranî li gor baweriya Kurdan a Yaresanî û bêdîrok in hene.


**Keşkûl:**

Yekem 'Keşkûl' ku bi piranî ji helbestên Kurmancî pêk tê di sala 1961'ê de di Pirtûkxaneya Mûsilê(Mektep Methef el Mûsil) de ji aliyê Abdulreqîp Yûsif ve hatiye dîtin. Ev keşkûl di sala 1767'an de hatiye nivîsandin û di sala 1971'ê de li Necefa Îraqê bi navê 'Dîwana Kurmancî' hatiye çapkirin. Di berhemê de helbestên 25 helbestvanên Kurd hene. Ev helbestvan; Eliyê Herîri, Melayê Cizîrî, Feqiyê Teyran, Melayê Bateyî, Macîn, Mensûr Girgaşî, Sadiq, Bekir Begê Erzî, Mele Xelîl in. Di sala 1988'an de li Swêdê ji aliyê Elîşêr(Ziya Avcî) ve hat latînîzekirin û di sala 2012'an de li Stenbolê bi tîpên Latînî hat çapkirin.

Keşkûla din jî di sala 1782'an de bi Goranî hatiye nivîsandin ji aliyê Şêxekî Senendecê Şêx Abdulmu'mîn bîn Cemaledîn Muhammed Letîf(1739-1797) ve hatiye amade kirin. Nushayeke ji vê berhemê li 'British Museum' ê bi hejmara 6444 hatiye tomarkirin û ji 84 rûpelan pêk tê. Di keşkûlê de 390 helbestên 40 helbestvanî hene. Xebata li ser vê nushayê ji aliyê E.B Soana ve di sala 1921'ê de hatiye kirin. Enwer Sultanî xebata (Anthology of Guran Poetry) giştî ku ji 437 rûpelan pêk tê li ser vê nushayê di sala 1998'an de kiriye. Nushayeke vê berhemê jî ku li 'Pirtûkxaneya Eyaleta Berlîn' ê bi navê 'Ms. Or. Fol.4218' hatiye tomarkirin ji 184 rûpelan pêk tê. Her wiha tê îddîakirin ku li St. Petersburga Rusyayê jî nushayeke vê berhemê heye.

Keşkûla ku di sedsala 19. de ji aliyê Mahmûd Paşayê Caf ve hatiye nivîsandin jiyan û helbestên nêzîkî 40 helbestvanî di xwe de dihewîne. Di nav van helbestvanan de ; Nalî, Salim, Kurdî, Bêsaranî û Xaney Qubad jî hene. Cîlda yekem di sala 2014'an de ji aliyê Dr. Hasan Caf ve hatiye amadekirin û di nav weşanên 'Bînkey Jîn' de hatiye weşandin.

Li gor nivîsa Enwer Mayî ya di sala 1961'ê de di kovara 'Ronahî' de hatiye nivîsandin, dema ku xwendekar



Mewlûda Kurdî yekem car bi Kurmancî ji aliyê Melayê Bateyî di sedsala 18. de hatiye nivîsandin. Di sala 1898'an de jî ji aliyê Mela Ehmedê Xasî ve bi Kirmanckî hatiye nivîsandin. Li gor lêkolîna M. Zahir Ertekîn ya di 2015'an de 49 (32 Kurmancî, 7 Kirmanckî, 10 Soranî û Hewramî) Mewlûd hatine nivîsandin.

bûye ligel xwendekarekî bi navê Feqî Mihemedê Dirêj keşkûlekê dibîne. Di wê keşkûlê de helbestên; Feqiyê Teyran, Pertew Begê Hekkarî, Meleyê Cizîrî, Remezanê Cizîrî, Evdal Semed Babek hebûne.

Di Pirtûkxaneya şexsî a Mela Elî de bi navê 'Keşkûla Kurmancî', ji 86 helbestên 36 helbestvanên ku di navbera 1000-2000'an de jiyane pêk tê heye. Berhem ji aliyê Prof. Dr. Celîlê Celîl ve di sala 2004'an de tê çapkirin. Pirtûk ji 308 rûpelî pêk tê.

Şêx Eskerî ku di sedsala 19. de li Medreseya Aktepeyê xwendekar bûye navê 'Keşkûl' dide pertûka ku helbestên xwe tê de nivîsandiye.

**Mecmua:**

Tevî mecmuayên tenê bi Kurdî, di hin berhemên pirzimanî de jî mirov rastî helbestên Kurdî tê. Yek ji mecmuayên pirzimanî jî ji aliyê Şêx Cuneydê Zoqeydî ve di sedsala 20. de bi 4 zimanan pêk hatiye ye û di nav mecmuaya ku ji 172 rûpelan pêk tê de bi Erebî: 48, Farisî: 20, Tirkî:2 bi giştî jî 129 helbest hene. Di mecmuayê de 49 helbestên; Feqiyê Teyran, Ehmedê Xânî, Melayê Bateyî, Mela Xelîl-ê Sêrtî, Şeyh Abdulqadirê Hezanî, Seyyîd Eliyê Findiqî, Mela Şems hene

Mecmuaya ji aliyê Mistefa Dehqan ve hatiye dîtin, di sedsala 17. de hatiye nivîsandin. Di mecmuayê de ligel; Hafiz, Cami, Saib-i Tebrizi ku wek mîrên helbesta Farisî tên zanîn helbestên Melayê Cizîrî jî hene.

Rîsale:

Rîsaleya ' Şair û Musennefên di Kurdistanê' de ku ji aliyê Mela Mehmûdê Bazidî ve hatiye nivîsandin, di sala 1860'an de ji aliyê A. Jaba ve li Petersburgê bi navê 'Recoeil de Notices Rêcits Kourdes' hatiye çapkirin. Di rîsaleyê de, di derheqê helbestvanan de agahî û çend mînakên helbestên; Eliyê Herîri, Melayê Cizîrî, Feqiyê Teyran, Melayê Bateyî, Ehmedê Xanî, Mela Îsmaîlê Bazîdî, Şerefxan ve Miradxanê Bazîdî hene.

**Antolojî:**

Mehmed Emîn Feyzî Bey tarafından 1339/1920 tarihinde yazılan 'Encümen-i Edîbân-ı Kürd' isimli antoloji, Sorani lehçesinde yazan 15 şairin şiirlerini ve hayatları hakkında kısa bilgileri içermektedir.

Antolojiya bi navê 'Encûmen-î Edîban-i Kurd' ku ji hêla Mihemed Emîn Feyzî Beg ve di sala 1920'an de hatiye nivîsandin, 15 helbestvanên ku bi Soranî nivîsandine hene. Di derheqê van helbestvanan de agahî hene. Çend mînakên helbestên van helbestvanan jî di antolojiyê de hene.

**Dîwanên Kurdî:**

Di cîhana Îslamê de ji berhevkirina hemû helbestên helbestkarekî re 'Dîwan' tê gotin. Tevî dîwanên windayî, di edebiyata kalsîk a Kurdî de nêzî 200 dîwan hene.

Berhema Kurdî ya hatiye tespîtkirin a yekem 'dubeyt'ên ji aliyê Baba Tahirê Hemedanî (z.? M. 1055) ve bi zaravayê Lorî di sedsala 10. de hatiye nivîsandin e. Tevî berdewamkirina spekulasyonan, tê îddîakirin ku Elî Herîrî di sedsalên 11/12. de 'Dîwanek'e bi Kurmancî nivîsandiye.

Heta niha Dîwanên bi Kurmancî ; Melayê Cizîrî (17), Feqiyê Teyran, Ehmedê Xanî, Wedâî (ss.18.), Şêx Ehmedê Feqîr (ss. 18.), Seyid Eliyê Findiqî, Seyid Qedrî Haşimî, Mela Zahîrê Tendûrekî, Şêx Evdirehmanê Axtepî, Mela Ebdulfettah Hezroyî, Pertev Begê Hekkarî, Mela Beşîrê Bedewî derdiketine holê. Di Soranî de jî Dîwanên; Sâlîm, Nalî, Mistafa Kurdî hene.

Piştî lêkolînên li Xorasanê çend helbestên Fuzulî bi Kurdî hatin dîtin. Piştî van kişifan derdikeve holê ku di wêjeya Kurdî de beşek wunda ye.

**Şehname:**

Şahname di lîteratûra Kurdî de kêm in. Piştî lêkolînên Behrooz Chamanara bi giştî Goranî nêzîkî 65 şahnameyên Kurdî hatine dîtin. Şahnameyên Kurdî hê jî di pirtûkxaneyên şexsî û saziyan de wek nivîs tên dîtin. Şahname mîna mesnewiyan xwedî hevdengan(kafiye) e lê ne bi arûz bi kite (hece) tên nivîsandin. Berhemên bi terza Şehnameyan di sedsala 16. de hatine nivîsandin. Çend ji şehnameyên Kurdî ev in; 'Rûstem û İsfandîar', 'Rûstem û Keykuzad', 'Îran û Turan', 'Barzname', 'Rûstam û Zanûn', 'Haft Leşker', 'Haftxan'.

**Mevlîd:**

Mewlûda Kurdî yekem car bi Kurmancî ji aliyê Melayê Bateyî ve di sedsala 18. de hatiye nivîsandin. Di sala 1898'an de jî ji aliyê Mela Ehmedê Xasî bi Kirmanckî hatiye nivîsandin. Li gor lêkolîna M. Zahir Ertekîn ya 2015'an 49 (32 Kurmancî, 7 Kirmanckî, 10 Soranî û Hewramî) Mewlûd hatine nivîsandin.

Ji sedsala 10. û vir ve berhemên Kurdî ku piranî bi Elîfbêya Erebî( Êzidiya Elîfbêya Sir jî bikar aniye) nivîsandine derdixe holê ku divê mirov bibêje 'Zimanên Kurdî' û 'Edebiyatên Kurdî'.

**Çavkanî:**

Selim Temo; 'Antolojiya Helbestên Kurdî, Weşanên Agorayê. Çapa. 2.

Abdurrahman Adak; 'Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk', Weşanên Nûbihar, çapa 1.

## Dîwan:

Li gor rêbaza Edebî ya Îslamî yekem 'Dîwan' ji aliyê Melê Perîşan Dînawerî(1356-1421) ve hatiye tertîpkirin. Li 'Pirtûkxaneya Merburg a Almanyayê' nushayên dîwana ku bi Goranî nivîsandiye hene. Yekem tertîpkirina Dîwana Kurmancî jî ji aliyê Melayê Cizîrî(1570-1640) ve hatiye kirin. Di 'Şerefnamê' ya ku di sedsala 16. de hatiye nivîsandin de qala Dîwana Kurdî a Yaqûb Beg tê kirin lê hê jî ev berhem derneketiye holê.

## Mesnewî:

Mem û Zîn: Di sala 1694'an de cara yekem Ehmedê Xanî bi Kurmancî nivîsandiye. 'Mem û Zîn', di sala 1856'an de ji bo Osmanî hatiye wergerandin. Mesnewiyek bi heman navî di salên 1800'an de ku bi Goranî/Hewramî hatiye nivîsandin lê nivîskarê vê mesnewiyê nayê zanîn. Perwîz Cîhanî li ser vê mesnewiyê dixebite.

Leylâ û Mecnûn: bi Goranî Elmâs Xân Kendoleyî (1732), Xaney Qubâdî (1741), Mela Weladxan (kopya:1885), Mîrza Şefî'ê Kulyayî (1834), Ebdulqadir Debayan (1985); di Kurmancî de Sewadî (1748/58), Melâ İsmaîl-ê Bûhanlû (ss. 18. Xorasan), Şêx Mihemed Can (1884), Mela Mehmûdê Bazîdî (nesirle, 1858), Hecî Ebdulfettahê Hezroyî (kopya:1975), Mela Mihemedê Hezanî (istinsah:1982); di Soranî de Mela Fercî Salih Şekîb (1942), Elî Kemal Bapîr (1950) ve Ebdulcebbar Axayî Kanî (çapa 2:1969) nivîsandine.

Husrev û Şirîn: Di Goranî de Elmâs Xân Kendoleyî (ss. 18. kopya:1889) nivîsandiye.

Yûsuf û Zûleyxa: Di Kurmancî de Selimî Suleyman (1754) nivîsandiye. Sewadî jî bi heman navî mesnewiyek nivîsandiye.

Seyfü'l-mülûk û bedî'ul'l-cemâl: Sîyahpoş Bi Kurmancî nivîsandiye.

Di sedsala 19. de Şêx Eskerî mesnewiyek bi navê 'İkdê Durfam' nivîsandiye.

---



FIRAT CEWERÎ

## Hemreş Reşo û Çiya

Ji ber ku dîroka çapemenî û edebiyata kurdî bi qutbirî hatiye, loma, gelek caran nifşek ji nifşê berî xwe bêhay gihiştiye. Gava nifşek bi xwe hesiyaye û dest bi xebatê kiriye, haya wan ji nifşê berî wan tunebûye. Loma, endamên nifşê nû gelek zehmetî kişandine û xwestine her tiştî ji xwe dest pê bikin û ji nû ve biafirînin. Dibe ku îro, bi xêra şoreşa teknolojiyê rewş hinekî hatibe guhertin. Lê ez bawer dikim dîsa jî haya gelek kesên ku di vê meydanê de hespên xwe dibezînin ji hin xebatên berê tuneye. Ez ê carina di vê stûnê de behsa hin xebat û tevgerên berî dema me bikim. Ji ber ku wan berî me, di bêîmkaniyên mezin de dest pê kirine û xwestine ji bo nifşê me bingehekî deynin da ku em avahiyeke qewîn û spehî li ser ava bikin. Ev dikare kovarek be, rojnameyek be, komeleyek be, an jî hin şexsiyet bin ku bi zehmetiyên mezin berê xwe dane pêşeroja me. Yek ji van kesan Hemreş Reşo û kovara wî ya bi navê Çiya ye. Ev Çiyaya ku ez ê behs bikim, ne Çiyayê meydana şer e ku kurdan hertim xwe spartinê. Ev Çiya, ya şexsiyetê kurd Hemreş Reşo ye. Dibe ku ji nifşê niha kêm kesan navê Hemreş Reşo û kovara wî ya bi navê Çiya bihîstibin. Hemreş Reşo jî welatiyê Osman Sebrî ye. Ew di sala 1939an de li gundekî Semsûrê hatiye dinyayê. Li bajarê Qeyseriyê Kolêja Amerîkî xwendiye. Di navbera salên 1957-1960î de li Stenbolê maye û di salên 1961-1963an de li Enqerê xwendina xwe ya li unîversîteyê dewam kiriye. Di sala 1960î de terka welêt kiriye û berê xwe daye Swîsreyê. Ji wir jî derbasî Almanyayê bûye û heta dawiya jiyana xwe, 2003an li Almanyayê maye. Ew jî mîna gelek rewşenbîrên kurdan ne bi saxî, lê bi mirîtî li welatê xwe vegeriyaye. Hemreş Reşo yek ji endamê nifşê berî me yê herî şareza bûye. Herçiqas ew di nav rêxistin û tevgerên siyasî de bû jî, lê hertim bala wî li ser ziman û edebiyata kurdî bûye. Bi taybetî jî wî qîmeteke mezin dida çapemeniya kurdî. Cara pêşî, bi xêra Hemreş Reşo beşek mezin ji hejmarên kovara Hawarê wek kitêb bi formeke biçûk gihîşt me. Min bi xwe, bi xêra vê keda Hemreş Reşo, di sala 1982an de kovara Hawarê bi dest xist û bûm şabaşvanekî wê. Min dûre xwest hemû hejmarên wê bigihînim nifşê me û ji mirin û bêdengiyê xelas bikim. Lê Hemreş Reşo bi xwe jî kovar derxistine. Heke kovarên ku derxistine ne zêde temendirêj bûne jî, sebebên wê diyar û eşkere ne. Xebatên wî li derveyî welêt, li biyanistanê bûye. Kurd ji hev perçe, bi şev û roj bi neyartiya li dijî hev re mijûl bûn. Digel rewşeke weha aloz û kambax jî dîsa Hemreş Reşo du kovar derxistine; Hêviya Welêt û Çiya. Niha, heşt hejmarên kovara Çiya ku di navbera salên 1965-1970î wek kovar derketiye û di sala 1974an de jî her heşt hejmar wek kitêbekê hatiye weşandin li ber destên min e. Kovar bi sernava "Kovara çanda kurd e" derketiye û li gora sernava xwe jî tevgeriyaye. Di pênc salan de 8 hejmar derketine. Ji hejmara 1ê û ber bi hejmara dawî de hejmara rûpelên kovarê hatine guhertin. Ji 14 rûpelan dest pê bûye û heta 30 rûpelî çûye. Şaîr û nivîskarên ji perçeyên welêt ên cihê tê de nivîsandine. Hejmarek ji nivîskarên kovarê nivîskarên kovara Hawarê bûne. Navdarên mîna Kamiran Ali Bedirxan, Nûredîn Zaza û Osman Sebrî jî di Çiya de nivîsandine. Ji bilî van navên naskirî û ji bilî nivîskarê kovarê yê berdewam Hemreş Reşo, M. Bor, Dilbirîn, Bavê Nûrî, Dilar, Siyamend, S. Hesen, Fuad Kemal, Şefo, Faîq Bucak, Can Salar, Şemo Bakurî, Misto, Şîro, Cemîla Cemîl, Qanadê Kurdo, Musa Anter, Îzolî, R. Zîlan, Biro Remî, Meksîmê Xemo, Nêwerê Bahoz, S. Botanî, Erebê Şemo û hin navên din. Nivîsên hin ji van navên naskirî ji berhemên wan hatine girtin û di kovarê de hatine weşandin, hinan jî raste rast ji kovarê re nivîsandine. Bêguman herî pir Hemreş Reşo bi navê xwe di kovarê de nivîsandiye. Ez nizanim ka gelo Hemreş Reşo tu berhemên edebî li dû xwe hiştine an na, ji ber ku ez heta niha pêrgî tu berhemên wî nehatime. Lê diyar e ji nivîskariyê wêdetir bala wî li ser çapemenî û weşangeriyê bûye. Cara pêşî dîwana Osman Sebrî ya bi navê Apo, bi xêra keda Hemreş Reşo gihiştibû min. Piştî rawestandina kovara Çiya, bi qasî ku ez zanim di nivîskarên kovarê de jî berdewamiyek çênebûye û navên wan hêdî hêdî hatine jibîrkirin.

Lê divê em qet keda Hemreş Reşo û keda ên berî xwe ji bîr nekin. Em bi wan hene…

# Elewî ji aliyê YE'yê ve bi fermî hatin nasîn



DERYA KILIÇ

**SERLÊDANA** di 19 Adara 2016'an ya Konfederasyona Yekîtiya Elewiyên Ewropa( KYEE) ji bo nûnertiyê ji aliyê Parlementoya Ewropa (PE) û Konseya Ewropa( KE) ve hat pesend kirin. Elewiyên li Ewropa bi vê biryarê hatin nasîn û di serî de li Almanya û Brîtanya baweriya Elewîtiyê wek fermî hat pesend kirin. Konfederasyona Yekîtiya Elewiyên Ewropa (KYEE) di hundirê xwe de 290 Navendên Çandî yên Elewiyan û nêzîkî milyonek Elewî dihewîne.

**Ev biryar dê ji bo Elewiyan çi bîne?**

Di Parlementoya Ewropa û Komîsyona Yekîtiya Ewropa de mafên Elewiyan hene ku di xebatên kanûnî û dadî de pêşniyaran bikin. Her wiha bêyî destûr dikarin di nav Parlementoya Ewropa û Komîsyona Ewropa de cih bigirin. Konfederasyona Yekîtiya Elewiyên Ewropa(KYEE) gava yekem dê bi komên ku di Parlementoya Ewropa de ne re Grûpên Hevaltiyê yên Elewiyan ava bike. Her wiha armanca Elewiyên Ewropa di sala 2019'an de bikevin hilbijartinên Parlementoya Ewropa û nûnertiya xwe bidest bixin. Li aliyê din Konfederasyona Yekîtiya Elewiyên Ewropa(KYEE) dixwaze li Brukselê û Strasburgê nûnertiya xwe veke û bi awayekî çalak siyasetê bike.

**Pirsgirêka Elewiyan li Tirkiyeyê; çima statûya 'Malên Cemê' nayên naskirin?**

Serokê Karûberên Diyanetê Mehmet Gormez, di Çileya 2016'an de li ser statûya Malên Cemê wiha axivîbû: "Du xetên me yên sor hene; me tu carî dev ji van xetên xwe yên sor bernedaye. Yek tarîfa Elewîtiyê ya li dijî Îslamiyetê ye. Dîroka hezar salî vê yekê di derewîne û nerastbûna van îddiayan derdixe holê. Ya duyem jî; nîşandana malên cemê wek alternatîfa mizgeftan bin û Elewîtî mîna baweriyeke ji Îslamiyetê cuda be." Ev daxûyanî wek "Malên Cemê xeta me ya sor e" hatin nirxandin û li Tirkiyeyê ji aliyê 25 milyon Elewî ve rastî rexneyên tund hat.

Malên cemê niha wek navendên çandî, sazî, dezgeh tên vekirin. Lê belê ji ber ku malên cemê wek îbadetgeh nayên pejirandin ji derfetên îbadetgehan jî sûdê wernagirin. Piştî serkeftina Hikûmeta AKPê berpirsyarên hikûmetê ragihandibûn ku dê heta salekê pirsa Elewiyan çareser bikin û wê statû bê dayîn malên cemê. Li gor vê yekê dê malên cemê mîna îbadetgehên din ji mesrefa karebê (ceyran) û avê bê par bin û kalên Elewiyan bibin xwedî mûçe. Lê belê ev du sal e di ser hilbijartinên 2015'an de derbas bûn û hê tu çareserî ne di rojevê de ye.

Herî dawî jî Cîgirê Serokwezîr Numan Kurtulmuş di 21'ê Adarê ku rojbûna Hz. Alî ye destnîşan kir ku bernameyek amade kirine û dê "Elewî û Dewletê li hev bîne" Lê belê Serokê Komeleya Çandî a Pîr Sultan Abdal Gani Kaplan, Serokê Dezgeha Çandî a Haci Bektaşi Veli, Tuncer Baş û Serokê Federasyona Elewî-Bektaşî Muhittin Yıldırım destnîşan kirin ku ev daxûyanî ji bo referandûmê ye û tevlî vê civînê nebûn.

Serokê Konfederasyona Yekîtiya Elewiyên Ewropa( KYEE) Hüseyin Mat di derheqê bidestxistina mafê Elewiyên Ewropa, Serokê Dezgeha Çandî a Haci Bektaşi Veli, Tuncer Baş jî di derheqê Elewiyên li Tirkiyeyê dijîn de daxûyanî dan Basê.

### "Em ê komkûjiyên li Elewiyan hatine kirin bixin rojeva YE yê"

Hüseyin Mat dibêje ku; "Nasîna li YE yê ne hêsan bû. Ev deh sal e em xebatê dikin. Lê her dem derbas bû tevgera mezin û bi hêz bû. Li her welatekî me xwe bi rêxistin kir. Her serkeftinek nasîna Elewiyan hêsantir kir. Ev yek jî riya ketina YEyê ji me re vekir. Li Parlementoya paytexta Brîtanyayê gelek hewlên me çêbûn û me komîsyonên dostaniyê ava kirin. Li Almanyayê, Danimarkayê, Swêdê û li çend Kantonên Swîsreyê Elewîtî wek baweriyeke xweser bi fermî hat pesend kirin. Mat dibêje "Em li Almanya û Brîtanyayê dersên Elewîtiyê" didin û wiha pê de diçe "Bi taybetî li Almanyayê van dersan mamosteyên Elewî didin û rêzêknameya dersan jî em destnîşan dikin. Em van dersan li dibistanên fermî yên Almanyayê didin. Di wê mijarê de ji xwe em li Ewropa wek baweriyeke xweser hatine nasîn. Ne tenê ji bo bidestxistina mafên Elewiyên Ewropa her wiha em ê ji bo Elewiyên li Tirkiyeyê jî xebatên xwe bidomînin. Elewî li Tirkiyeyê rastî gelek komkûjiyan hatin. Em ê van mijaran li Parlementoya Ewropa bînin rojevê. Em ji YEyê tu pere û mûçe nastînin lê projeyan amade dikin."

### "Daxwaza me ya sereke bidestxistina statûya îbadetgehê ya malên cemê ye"

Serokê Dezgeha Çandî a Haci Bektaşi, Veli Tuncer Baş destnîşan dike ku: "Destkeftiyên li Ewropa serkeftinên girîng in. Dê ev destkeftî doza me ya li Tirkiyeyê jî bi awayekî erênî tesîr bike. Em li Tirkiyeyê jî van xebatan dikin. Armanca me ya sereke pesendkirina malên cemê wek îbadetgehan û rakirina dersên mecbûrî yên olî ne. Li Tirkiyeyê ji 20 milyonî zêdetir Elewî hene lê mixabin destkeftiyên me pir kêm in." Baş axaftina xwe wiha didomîne: "Li Tirkiyeyê bi giştî rewşa demokratîkbûnê ber bi paş ve diçe. Di mafên Elewîtiyê de jî paş ve çûn çêdibe. Em di dewleteke ku bi rewşa awarte tê îdarekirin de dijîn. Demokrasî çiqas paş dikeve ew çend jî mafên mirovatiyê û Elewîtî û kêmnetewe rastî dezavantajên mezin tên."



---

## Wergirtina penaberan

# Têkiliyên Tirkiye-Almanya xera kir

**TÊKILIYÊN** Almanya û Tirkiyeyê piştî hewldana darbeya 15'ê tîrmehê û referandûma 16'ê nîsanê di tengezariyê de ne. Almanya daxwaza penabertiya lîwayên payebilind yên Tirk piştî hewldana darbeyê pesend kir, Tirkiyeyê jî rêya serlêdana baregeha Încîrlîkê ret kir. Ev her du mijar jî bûn sedema tengezariyê di navbera Berlîn û Enqereyê de.

Li gor daneyên Navenda Îstatîstîkî ya Ewropa (Eurostat); serlêdanên di 2016'an de ji bo penabertiyê ya Almanyayê ji 27 welatên YE yê zaftir in û ev daxwaz ji aliyê berpirsyarên Almanî ve hatiye pesend kirin. Li gor bersiva Hikûmeta Almanyayê ji bo pirsa tora medyayî ya Funke, di navbera meha çile-mijdarê de ji Tirkiyeyê 5 hezar 166 daxwaza serlêdana penabertiyê hatiye kirin. Ji van serlêdaran jî %80 Kurd in.

Berpirsyarên civaka Kurd li YE yê û berpirsyarên Civaka Sivîl yên Kurd yên li Almanyayê ji Basê re ragihandin ku di dema proseya aştiyê de daxwazên dihatin wergerandin piştî şerê li Bakurê Kurdistanê cardin hatin nirxandin û piranî jî hatin pejirandin.

**Tengezariyên din yên di navbera Almanya û Tirkiyeyê de**

Daxwaza serlêdana Încîrlîkê ya Komîsyona Bergiriyê a Almanyaya Federal û Tirkiyeyê ji aliyê Tirkiyeyê ve hatibû red kirin. Ev yek bo sedema tengezariyê. Angela Merkel got ku ev biryar 'nayê pejirandin' û wiha domand "Divê em alternatîfên Încîrlîkê binirxînin, Urdun jî alternatîfek e." Piştî girtina rojnameger Deniz Çiftçi li Stenbolê, Wezareta Derve ya Almanya bangî Balyozê Tirkiyeyê yê Berlînê kir. Ev yek bû sedema tengezariyê di navbera her du welatan de. Qedexekirina civînên siyasetmedarên Tirk li Almanyayê tengezariya di navbera her du welatan de kûrtir kir.



> Serokê Civaka Kurd ê Almanyayê Elî Ertan Toprak dibêje: "Piştî hewldana darbeyê serlêdan zêde bûne. Her wiha serlêdanên ji Tirkiyeyê hatine di van mehên dawî de 8-9 hezar zêde bûne û ji van serlêdanan jî ji 4 kesan 3 kes Kurd in.

**"Ji 4 penaberan 3 Kurd in"**

Serokê Civaka Kurd ê li Almanyayê Elî Ertan Toprak dibêje: "Piştî hewldana darbeyê serlêdan zêde bûne. Her wiha serlêdanên ji Tirkiyeyê hatine di van mehên dawî de 8-9 hezar zêde bûne û ji van serlêdanan jî ji 4 kesan 3 kes Kurd in." Toprak dibêje, di sala dawî de nêzîkî 500 hezar kesî ji bo penabertiyê serî li Almanyayê daye û wiha didomîne: "Di du salên dawî de li Bakurê Kurdistanê şer û pevçûn zêde bûne. Gelek bajar wêran bûne. 500 hezar Kurd ji warên xwe penaber bûne. Ev di belgeyên Neteweyên Yekbûyî de jî cih girtiye. Ji ber zilma dewletê, Kurd direvin û serî li penabertiya Almanyayê didin." Her wiha riyên hatina Almanyayê girtiye, eger vekirî bûya dê zaftir însan bihatana Almanyayê. Toprak dibêje ku li gor danezanînên Almanyayê tenê ji %8 daxwazên serlêdêran hatiye pesend kirin. Yên din jî di dozgeriya îdarî de niha doza wan tê dîtin. "Serlêdana pêşî li Daîreya penabertî û Penabertiya Federal tê kirin. Îfada yekem li wir tê dayîn û biryara pêşî ew didin. Eger red bikin proseya dozgeriyê destpê dike. Li Daîreya penabertî û Penabertiya Federal tenê serlêdanên ji %8 tê pesend kirin. Yên daxwaza wan tê red kirin jî der sînor nayên kirin û li benda encama doza wan disekinin."

**Serlêdanên Kurdan ên di dema 'Proseya Aştiyê' de red dibûn**

Toprak, li gor dema pêvajoya çareseriyê, serlêdanên ji aliyê Kurdan ve tên kirin zêde bûne. Di dema proseyê de pesendkirina daxwaza penabertiyê zehmettir bû. Li gor du sal berê pesendkirina serlêdanên Kurdan zêde bûne. Lê êdî tenê Kurdbûn têr nake. Di heman demê de divê di bin zexta siyasî de be jî serlêder. An jî ji ber xebatên siyasî li Tirkiyeyê di bin zilm û zextê de be. Eger ev yek bê îspatkirin, serlêdana serlêdaran tê pejirandin.

Toprak dibêje Almanya ji bo mafên penaberan yek ji dewletên herî baş e û wiha didomîne: "Dema yekem car tên Almanyayê li kampên penaberan tên bi cih kirin. Kamp, hinek zehmet e. Bi hemû kesên ji deverên cîhanê yên cûr bi cûr re dijî. Piştî re jî penaber ji aliyê berpirsyaran ve li malên taybet tên bicih kirin. Şertên li Almanyayê li gor dewletên din pir baş in. Her wiha di warê civakî de jî ev welat zaf baş e. Piraniya Kurdên Ewropa li Almanyayê dijîn. Nas û pismamên gelek kesan li vir in. Almanya ji xeynî şert û mercên baş ji aliyê demokrasiyê ve jî dewleta herî zêde tê tercîh kirin e."

**"Serlêdana penabertiyê li Almanyayê mafekî destûrî ye"**

Elî Ertan Toprak di derheqê derfetên penaberiyê de wiha diaxive: "Her kesê ku li welatê xwe ji ber siyasetê zext û zordariyê dibîne dikare serî li penabertiya Almanyayê bide. Pirsgirêk xwegihandina Almanyayê ye. Dema gihîştin Almanyayê pirsgirêk namîne. Li vir her kesek dikare serî li penabertiyê bide. Serlêdana penaberiyê li Almanyayê mafekî destûrî ye."

### Yıldırım: Ger Almanya berê xwe bide Tirkiyeyê

Serokwezîrê Tirkiyeyê Binali Yıldırım heftiya din di komcivîna AKPê de di derheqê têkiliyên Almanya-Tirkiyeyê de axivî. Rexne li wergirtina daxwaza penabertiya lîwayên Tirk girt û got: "Eger Almanya daxwaza têkiliyên xwe ligel Tirkiyeyê baş bike, mecbûr e berê xwe bide KomaraTirkiyeyê, nede Feto û dabeşkeran"

Serokê Grupa Parlementoyê ya Yekîtiya Xirîstiyanan Volker Kauder jî rexneyên Yıldırım bersivand. Li Almanyayê serlêdanên penabertiyê bi pêvajoya hiqûqî tên nirxandin û wiha pê de çû: "Tu rexneyek nîn e li hember vê proseya dewleta hiqûqî"

Zarok zaroktiya xwe najîn

# Zarok li şûna dibistanê berê xwe didin kar



CESÎM ÎLHAN

Bi hatina baharê re ji Bakurê Kurdistanê her sal bi hezaran zarok ji malên xwe dûr dikevin, ber bi herêmên cuda yên Tirkiyê ve diçin û di şert û mercên gelek dijwar de di karê komkirina pîvaz, pembû, çay û findiqan de dişixulin. Bajarên ku koça ber bi metropolên Tirkiyê ve zêde ye; Riha, Amed, Êlih û Semsûr e. Zarokên karker, di karên dijwar yên wek findiq, fêkî, silk, darşekir, birînc, çay, titûn, sewalkarî, şivanî, pembû û înşeatan de kar dikin.

Zarokên malbatên mexdûr yên ku li herêmê ne û debara wan li ser vî karî ye, ji bo alîkariya malbata xwe xwendina xwe nîvco dihêlin û ji neçarî berê xwe didin xebat û karên giran. Herçiqas qanun destûr nedin ku zarokên li jêr temenê 15'an bixebitin jî, li gor daneyên dawîn yên Saziya Statîstîk a Tirkiyê (TUIK) hejmara zarokên karker zêde bûye.

**"Divê dewlet çareyekê bibîne"**

Endama Lijneya Giştî ya Komeleya Gündem Çocuk û Koordînatara Navenda Mafên Zarokan Ezgi Koman, ji Basê re radigihîne ku salên dawîn hejmara zarokên karker zêde bûye. Koman diyar dike ku zarokên 6-7 salî di karên giran de tên xebitandin û ji bo pêşîgirtina vê yekê kontrolek jî nîn e. Koman herwiha dibêje ku mekaîzmaya kontrolê bo zarokan birêve naçe û divê dewlet çareyekê bibîne ku êdî zarok neyên xebitandin.

**"Sedema binketinê, nexwendin e"**

Serokê Şaxa Eğitim Bir-Sen a Şaxa Rihayê İbrahim Coşkun, eşkere dike ku li Rihayê hejmara zarokên karker ên demkî xwe li sed hezaran daye û wiha pê de diçe: "Di vê serdemê de jî zarokên karker yên ku havînan ji cih û warên xwe dûr dikevin hene. Hejmara van zarokan teqabûlî ji sedî 15'ê hejmara xwandekarên li Rihayê dike. Lewma vê hejmarê niha xwe li sed hezaran daye. Ji bo ku ev zarok biçin dibisatanên xwe û xwendina wan nîvco nemîne û herwiha bo serkeftina Rihayê, divê malbatên van zarokan di karên sanayî û febrîqeyan de werin bicihkirin.



Li Bakurê Kurdistanê nêzî 500 hezar zarok li şûna ku di dibistanan de bin û bixwînin, neçar dimînin ku bişûxilin. Li herêman roj bi roj rêjeya zarokên dixwînin kêm dibe û hejmara zarokên karker zêde dibe.

**"Şert û mercên jiyan, xebat û karên zarokan..."**

Pirsgirêk û kêşeyên ku karkerên zarok tûşî dibin, ne tenê xwendin û perwerde ye. Pispora Ewlekariya Kar, Fidan Yıldırım radigihîne ku karkerên zarok di zeviyên vala, kon, avahiyên prefabrîk û malên bo karkeran hatine veqetandin de dijîn. Li gor agahiyên ku Yıldırım dide, gelek gilî û gazinên zarokan hene. Sedema van gilî û gazinan jî şert û mercên kar û cihên mayînê yên van zarokan in. Mercên giran û dirêj yên xebatê zarokan aciz dikin. Jibilî vê yekê, ji ber dûpişk û maran jî zarok rastî gelek kêşeyan tên.

**Divê aboriya herêmê bê geşkirin**

Serokê Sendikaya Kar û Cotkariyê yê Şaxa Amedê Beşir Işık, diyar dike ku rêjeya zêdebûna zarokên karker di hemû beşên kar de, birîneke herêmê ye. Işık wiha dibêje: "Di hemû beş û warên kar de zarokên karker hene. Karkeriya zarokan a ku ji Edenê bi pembû destpê dike, li Behra Reş bi findiqan û li Niğde – Aksarayê bi komkirina sêvan berdewam dike û zarokan bi wesayîtên ku derqanunî ne û ne ewle ne dibin van cihan û didin xebitandin. Dema beşeke vî karî rastî serdema dibistanê tê. Malbat ji ber ku an bi metre an jî bi kîloyan kar digirin, bêyî ku li temen û dibistana zarokan binêrin, dibin kar. Heta niha tu hikûmetan çareseriyek ji vê meselê re nedît. Ji bo zarok di temenê xwe yê biçûk de ji vê karkeriyê xilas bibin, divê aboriya herêmê pêşketî û baş be. Divê dewlet aboriya herêmê geş bike.

**Ji 10 zarokan 8 zarok derqeydî ne**

Herçiqas zarok li bajar û çolterê bi şêwe û rêbazên cuda bên xebitandin û îstîhdamkirin jî, ji bajaran jî û ji çolterê jî zarok bêyî sîgorta û qeyd dixebitin. Li gor daneyên TUIK'ê yên sala 2016'an ji sedî 78'ê zarokan li derqeydî, yanê bêyî sîgorta tên şixulandin. Di sala 2016'an de hejmara zarokên di temenê 15-16'an de weke 708 hezar hat tomarkirin. Ji van zarokan 558 hezar bêyî sîgorta û qeyd dixebitin û tenê 150 hezar zarok xwedî sîgorta bûn.

## Herî zêde zarokên karker li Rihayê ne

Li herêmê ji bajarên ku herî zêde zarokên karker hene, di serî de Riha tê. Li gor raporta bi navê 'Ev kar ne karê zarokan e' ku ji aliyê Piştgiriya Jiyanê Alîkariya Mirovî û UNICEF'ê hatiye amadekirin, ji sedî 15'ê malbatên li Rihayê herî kêm zarokekî karker heye. Dîsa li gor vê raportê zarokên derdora temenê 14'an li kargehan rastî tundî û îstîsmarê tên. Li gor raportê li Rihayê ji sedî 15'ê zarokên ku naçin dibistanê, 12-14 seatan tên xebitandin û neçar dimînin ku ji xwendina xwe veqetin.

## Zarokên Sûrî, erzantir tên xebitandin

Hejmara zarokên Sûrî yên ku ji ber şer û pevçûnên welatên xwe ber xwe dane Bakurê Kurdistanê roj bi roj zêde dibe. Li herêma Riha, Semsûr, Êlih, Amed çend bajarên sereke ne ku ketine bin bandora vê koça neçar. Zarokên van malbatên Sûrî jî ku ji neçarî koçî herêmê kirine jî ji bo debara malbat û jiyana xwe neçar dimînin ku kar bikin. Zêdetirê nîviyê van zarokan, ji ber ku ji derfetên xwendinê bêpar in, bi derqeydî û şert û mercên dijwar de dixebitin. Xwediyên kargehan jî temenê van zarokan û nebûna statûya welatîbûnê ji bo xwe weke fersendekê bikar tînin û di şertên dijwar û bi pereyekî kêm didin xebitandin.

## Zarokên keç, ji zarokên kur zêdetir dixebitin

Karên cotkarî û înşeatê ji bo zarokan karên herî giran tên zanîn. Nemaze jî zarokên keç di karên cotkariyê de roleke girîng dilîzin. Ji sedî 51'ê zarokên kur û ji sedî 62'ê zarokên keç neçar in ku bixebitin. Herwiha tê ragihandin ku zarokên keç, ji zarokên kur zûtir dest bi xebata cotkarî û zeviyan dikin. Ji sedî 92'ê zarokên kur di temenê 15-18'an de di zeviyan de dixebitin. Ev rêje bo zarokên keç ji sedî sed e û hemû zarokên di vî temenî de karê cotkariyê dikin. Sedema vê cudahiyê jî ew e ku beşeke zarokên kur xwendina xwe berdewam dikin. Lêbelê zarokên keç dema ku dixebitin nikarin xwendina xwe berdewam bikin û ji dibistanê vediqetin.

Ajokarên texsiyan yên Kurd

# Karê me wek berê ne baş e



GÖNÜL GÜN

Pir caran xerîbên ku diçin bajarekî sifte ji aliyê ajokarên texsiyan yên wî bajarî ve tên pêşwazî kirin. Gelo ajokarên ku her roj li ser dîroksîyonê xwîdan dirijînin di kîjan şert û mercan de dişuxilin? Me wek rojnameya Basê bi ajokarên texsiyên Enqereyê re xeberda. Ajokarên Kurd yên li Enqereyê dibêjin karê wan mîna berê ne baş e, ji ber zêdebûna xetên metroyê û dîsa ji ber kirîna wesaîtên şexsî, ajokarên teksiyan zêde kar nakin. Li gor ajokaran mesrefên sîgorta, bacê û cizayên trafîkê gelek zêde ne.

**Keda sî û pênc salî ya ajokariya texsiyê**

Orhan Koyuncuyê ji Kurdên Haymanaya Enqereyê dibêje ev sî û pênc sal e bê navber ajokariya teksiyê dike û ew ji malbata xwe hînî vî karî bûye. Koyuncu dibêje heta niha bi tenê li Enqereyê xebitiye. Koyuncu amaje dike ajokarên teksiyê yên Enqereyê bi vardiya roj û şevê kar dikin û wiha qala saetên vî karî dike;

"Di saet 07:30'an de vardiya serê sibêyê dest pê dike û heta saet 16:00'an. Vardiya şevê jî di saet 16:00'an dest pê dike heta saet nîvê şevê 02:00 -03:00'an."

Koyuncu dibêje wî her tim ajokariya êvarê kiriye û hin rojan di navbera 10-12 saetan de xebitiye. Koyuncu amaje dike ku di karê ajokariya texsiyê de ji serî heta dawiyê mesref (lêçûn) hene û ev yek wan dixe tengasiyê û qezanca wî incax têra wî û malbata wî dike. Ajokarê Kurd wiha behsa rewşa karê xwe dike;



Ajokarên texsiyan yên Kurd ku bi salan e li Enqereyê dixebitin dibêjin sîgorta, bac û mesrefên muayeneya wesaîtê û cizayên trafîkê wan ji aliyê aborî ve dixe tengasiyê. Karê ajokarên ku bi salan e texsiyê dajon van rojan ne baş e.

"Ji xwe karê me ne baş e, gaz biha ye. Yek jî sîgortayên trafîkê gelek zêde ne. Dema ku wesaît têne guhêrandin, mesrefên sîgortayên wesaîtên me derdikeve 5 mîlyar û nîvan. Bacên me jî zêde ne. Gava ku bi salinî wesaît têne guhêrandin em biqasî 10-15 mîlyarî cizayên trafîkê didin.

**"Potansîyela kar yên rawestgehan ji hev cuda ne"**

Ehmet Sağlamê Kurdê Haymana Enqereyê jî dibêje ev panzdeh sal e ajokariya texsiyê li Enqereyê dike û wî ev kar ji malbata xwe hîn bûye. Sağlam dibêje ew zêdetir di vardiyaya rojê de dixebite.

Sağlam destnîşan dike ku ji bo ajokariya texsiyê divê pêşî plakeyek wesaîtê bê kirîn û ev plaka bê qeydkirin paşê jî divê ji Cemîyeta Ajokaran sertîfikaya ajokariyê bê standin. Sağlam wiha axaftina xwe didomîne, "Divê ji Cemîyeta Texsîyan rawestgeh bê kirîn. Paşê ajokarê texsîyê dikare di wê rawestgeha ku cî jê kiriyê de dest bi kar bike. Ev cî êdî heta ku rawestgeh guhêrî an jî bi temamî rawestgeh ji holê rabû ya ajokarên ku heqê wî cihê daye ye. Yanê herkes nikare li her cihê ajokariya texsiyê bike."

Sağlam diyar dike ger ajokar bixwaze biçe di rawestgeheke din de bixebite, heke ajokarekî din jî hebe, ne lazim e ev ajokar biçe Cemîyeta Texsîyan, dikare cihê xwe bifiroşe ajokarekî din.

Sağlam dibêje çawa ajokarên ku girêdayî rawestgehekê dixebitin hene di heman demê de ajokarên bê rawestgeh dixebitin jî hene û ji wan re 'texsiyên korsan' tê gotin. Li gor Sağlam ger ajokar girêdayî rawestgehekê bixebite feydeyên wê ev in;

"Ajokarê ku cî kiriye rehet dike. Çimkî bi awayekî aram nanê xwe dixwe, çaya xwe vedixwe û bêhna xwe dide. Ger rêwiyên wî hebin dixebite, lêbelê karê ajokarên ku bê rawestgeh dixebitin zehmet e."

**Ewlehiya canê ajokaran tune ye**


Xelîl Kaya jî li navenda Enqereyê bi salan e ajokariya texsiyê dike û dibêje hin kes hene him xweyî wesait û ajokar in hin kes jî hene bi tenê ajokar in. Kaya wiha diaxive;

"Ajokarên ku wesaîtên wan tune ye dest nadin tiştekî. Bi rojan li gor bihayekî diyarkirî kar dikin. Ger em ajokarekî şevê bifikirin, şevê 250 TL qezenc bike 50TL diçe gazê, 100 TL diçe xwediyê wesaîtê û pereyê mayî jî ji wî re dimîne."

Kaya dibêje xwediyê texsiyê zêdetir bi rawestgehê re mijûl dibe, cizayên trafîkê yên hatî dişopîne û muayeneya wesaîtan re elaqedar dibe." Kaya balê dikişîne û dibêje mîna berê ji ajokariya texsiyê pereyan baş qezenc nakin.

Kaya dibêje di nav zehmetiyên karê ajokariyê de yek jî ewlehiya canê ajokaran tune ye û ew diyar dike ku roj û şev ferq nake ewlehiya ajokaran tune ye. Kaya dibêje ji ber vê sedemê karê ajokariyê di kategoriya karên bi xeternak (bi rîsk) de ye û bi taybet dibêje divê dezgeh û saziyên elaqadar tevdîrên ewlehiyê bo ajokaran bigirin.

# Çatrayîrê kulturan: Gurcîstan



**DINYA** hende gird a ke beno ke emrê merdimî/e qîm nêkero seba keşfkerdişê qitayan, welatan û şaristanan. Eslê ci de dinya hetêk ra zî nameyê yew silayî (dawet) ya. Kesê ke goş danê aye û vejînê rayîr, cayanê newe û balkêşan şinasnenê. Bêguman merdim ganî ge-ge seyahatan zî biko, rengan û venganê sewbîna dîyaran zî bivîno. Çunke her goşeyê dinya de berê ke hîkayayanê cîya-cîyayan rê abenê estê. Bero ke ma na hûmare de nîşanê şima bidê, nameyê ey Gurcîstan o. Gurcîstan, başûrê Qefqasya de ca gêno. Ma şima rê çend taybetîyanê Gurcîstanî wina rêze bikê.

1-Gurcîstan o ke nuqtaya çatrayîrî yê hewzayanê kulturanê cîya-cîyayan o, hetê mîmarî ra yewîya uslubanê rojhelatij û rojawanijan ra awan beno.

2-Medea ke karakteranê muhîman yê mîtolojîya Yunanî ra ya, prensesa mintiqaya Kolhîs a ke ewro mîyanê sînoranê Gurcîstanî de manena.

3-Şima eşkenê awanê madenan (soda) yê tewr kalîteyînan yê dinya Gurcîstan de bişimê.

4-Gurcîstan de tewirê tewr populer yê sporî futbol o.

5-Alfabeya gurcîyan o ke terzê aye xo rê xas (munhasir) o, tarîxê aye kehen o û reseno Îsayî ra pey (ÎP) serra 430î

6-Tarîxê muzîkê Gurcîstanî qedîm o, welat sey cayo bingeyin yê muzîkê zafvengin qebul beno.

7-Mintiqaya Usahgulî ke çend dewan ra awan bena, berzîya aye 2.100 metre yo. Na mintiqa çend cayê zaf berzî yê Ewropa ke tede merdimî bi hawayo daîmî meskun ê, sey yewê înan qebul bena.

8-Şikefta (mixaraya) Kruber a ke bi 2.100 metre xorînîya xo şikewta tewr xorîne ya dinya ya, Gurcîstan de ca gêna.

# Derzînî Qatîlê Qîcanê Şima yê!



ELÎDA ZERRÎ

**GAMA** ke yew qicî (dergûşî) yenê dinya hetanî ke benê pîl pancas hebî derzînî dîyeno înan ra. Çimê şima hîna abîy ney?

La şima vanê kê, derzîne hol/baş a, semedê sihhatê qicanê ma zaf hol/baş a! Labelê şima nêzanê; pêro derzînî jehr ê. Çimê şima reyna abîy ney? "ha hol a, hol a". Şima çimê xo hînî akêrî.

Mîyanê derzînan de DNAyê heywanan estê, alumînyum esto, cîva esta, vîrûs û bakterîyî estê. Nê pêro jehr ê û qicanê şima kenê nêweş. Fîrmayî bi derzînan ma xapenenê. Vanê, derzînî hol ê, şima rê sihhetî danê, bi sayeyê derzînan qicê şima qet nêweş nêbenê.

La nê pêro zûr ê, nêbo ke şima bawer bikêrî. Menfîetê înan estê, cayê endîstûrîyê îlacan de cayê derzînan zaf-zaf muhîm o. Eke derzînan ra nêbo, endîstûrîyê îlacan îflas keno. Fîrmayê îlacan bê derzînan nêeşkenî pay ra vinderî. Qicanê ma pê derzînan kenê nêweş û mûşterîyê xo hadre kenê. Nika pêro qicê ma nêweş î. Vere cû zî nêweşî estbîy, labelê o wext feqîrîye estbî, hîjyen çîn bî. Coka.

La nika hîjyen esto û feqet reyna zî nêweşî zî bîyê zêde. Çimkî vere cû derzînî çîn bîy, zaf-zaf hîrê-çar hebî estbîy yan çin bîy. Labelê goreyê meqaleyanê ke warê sihetî de nusîyayê nika çewres û new tewir derzînî danê qican ro. Pêro zî îthal ê û pêro zî benê sedemê nêweşîyan.

Nimûne; otîzm 1970î ra hetanî nika hîrîs qatî bîyo zêde/vêşî. Çira? Semedê derzînan ra!

Dr. David Brownstein vano kê; "Derzînî qicanê şima otîstik kenê. Çimkî muhtewaya derzînan de DNAyê însanan estê, cîva esta, tewir bi tewir çî estê. Coka otîzm hende bîyo zêde bîya"

Dr. Helen Ratajczake zî vana ke; " Derzînî dîrencê (bağışıklık) qicanê şima danê war. Sihetê qicanê şima rê zerar danê û xerîpnenê û verê nêrehetîya otîzmî akenê"

Dr. Wakofield, Dr. Bart Classen, Prof. Ahmet Aydin zî vanê 'derzînî qicanê şima otîstik kenê.'

Hetta Donald Trump zî vato kê; " Mi qet derzîna grîbî xo ra piro nêdaya. Coka ez qet grîb nêbena. Ez bedenê xo rê jehr enjekde nêkena. Faydeyê derzînan çîn o."

Donald Trump hesabê xoyê twîtterî ser ra zî vato ke; "Qicî bisihet şinê doxtor û derzînî dîyenê înan ra, dima zî hedî-hedî nêweş benê û peycû zî benê otîstîk."

La ma vînenê ke teyna otîzm zedê nêbîyo; astim, MS, dîyabet, qanser û xaftela/nika ra merdîşê qican zedê bîyê. Dr. Le Houezec vano kê; "Serra 1992î ra pey Fransa de pirodîyayîşê derzînanê Hepatît Byî dest pêkerdo. Ê wextî ra pey MS zî bîyo zêde. 1993 de hûmara nêweşanê MS di hezar û panc sey kesî bîye, 1996 de na hûmare vejîya çar hezar û panc sey. Û roj bi roje zêdê bena."

Prof. Alîşan Yildiran zî vano; " Derzînê Hepatit Byî sîstemê sînîrî xeripnenê. No semed ra zî MS peyda beno."

Dr. Prafull Vijayakare vana kê; " Derzînî qetîlê qicanê şima yê. Qicê şima bisihet yenê dinya, derzînê wenê û peynî de bene nêweş. Hînî pêro mayan û pîyan çimanê xo akerdî. Vînenê kê derzînî qicanê înan nêweş kenê û fîrmayanê îlacan û doxtoran zî zengîn kenê. Fîrmayê îlacan, mayan û pîyan xo rê sey muşterîyanê ke derzînan biroşê ci vinênê.

CDC (Centers for Disease Control Diseas) yanî endîstûrîye îlacan û nêweşîyan vano; " Derzînanê qicanê xo de teqsîr nêkerê, pêro derzînanê înan piro bidê, şima zî derzîna grîbî îhmal mekerê. Derzînî seba weşîya/sihetê şima zaf muhîm ê.

Labelê seke ma cor ra zî va û şima zî vînene ke no vatiş zûr o, xapenayîş o. Zafaneyê cigereyoxan û doxtoran vanê ke "derzînî jehr ê."

Na zî enteresan a; kam doxtor/e vajo 'derzînî jehr ê' , yan mireno/a yan zî lîsansê ey/aye yeno îptal kerdene.

CDC bîyo zengîn, yanî derzînan rê zaf çî deyndar o. Tib wina yo; verê to keno nêweş dima zî piştîya to ra beno dewlemend/zengîn.

Tirkîya de verê cû derzînî mecbûrî bîy, nika mecbûrî nîyê. Çimkî zafanê mayan û pîyan çimanê xo akerdî û mehkemeya qanûnê bingeyinî rê gerre kerd. Xulasa nika zafaneyê mayan û pîyan bawerîya xo bi zuranê endustrîyê îlacan û nêweşîyan nêanê û derzînan nêdanê qicanê xo ro. Ez yewa înan a. Sihetê qica mi ca de yo. Qet nêweş nêbena. Ez surînce ra, mîrkutîkî ra nêtersena. Xora derzînî zî înan rê engel nêbenê. Merdim derzîne piro bido nêdo taye qicî/domanî nê nêweşîyan vîyarnenê. Xora surînce, mîrkutîkî, algoşe nêweşîyê muhîmî nîyê. Nika belkî nê nêweşîyî biney bîyê tay (şenik). Labelê nêweşîya astimî zaf zêde bîya, otîzm ancîya winî, heyf ke MS, dîyabet, qanser zî. Zafaneyê cigereyox û doxtoran vanê kê; "Sebebî pêroyê nê nêweşîyan "derzîn bi xo yê."

Şima zî hînî çimanê xo akerî. Tayê biwanî, prospektûsê derzînan biwanî û bicigêrê, derzînan ser o bifikirîyê. Ma qey sihatê qicanê şima hende bêqiymet o?

# Nêwaştişo Cinsî û Sedemê Ey



**SEKE** cinî texmîn kenê aqilê her camêrdî ra tim seks nêvîyareno yan zî yew cinîya ke seksî asena, beno ke performansê aye cile de bêqusur nêbo. Tu eleqeyê serûşeklî (aseyayîşî) û fikranê farazîyan bi seksualîte çin o. Newaştişo cinsîyo ke mabênê mêrdeyan û cinîyan keno serdin, sedemê ey bi goreyê cinîyan û camêrdan cîya-cîya yê. Goreyê vatişanê pisporan sedemî nê yê:

Cinîyan de rewşê sey kêmtembîhbîyayîş (yetersiz uyarılma), depresyon, partnerê xo de lejkerdiş, nefret, ters, problemê pênekerdişî, nêweşîya enflamatuarê pelvîkî, hesarê sînîrî ke badê yew emelîyetî virazîyayê, nêweşîyê ke bi têkilîya cinsîye vîyarenê, xirabîya pelvîsî, dîyabet, nêrehetîyê norolojîkî, bêmuwazeneyîyê hormonalî, nêweşîya epîlepsîyî, menopoz, diganîyîye, kanser, mubtelabîyayîşê alkolî, tayê îlacê tansîyon û kemoterapîyî, mîyanê şertanê komelkîyan ke ser o tesîrê tabuyan estbîyo de pîlbîyayîş, tayê tedawîyê tibîyî sedemanê serekeyanê nêwaştişo cinsîyo ke cinîyan de yenê vînayene ra yê.

**Vajînusmus:** Eke edeleyê ke dormeyê fekê vajîna de ca gênê, bi dej spazm bivîyarnê, na yew nêweşîya cinsî ya û sey vajînusmus name bena. Netîceya nê spazmî de fekê vajîna beno teng. Vajînusmus verê têkilîya cinsî de yew astengîya muhîme teşkîl keno. Goreyê netîceyanê cigêrayîşan na nêweşîye welatê rojhelatî ke tede cinîyan ser o zaf zext û tedayî benê, înan de hîna zaf yena dîyayene. Çunke cinîyan de peydabîyayîşê vajînusmusî bi nîsbeto pîl mîyanê înan de ters zî tede girêdayeyê faktoranê psîkolojîkan yê negatîfan o.

**Vajinit:** Gama ke edeleyê vajînalî enfeksîyon yan zî sewbîna sedeman ver îltîhab bigîrê û tahrîş bibê, tekilîya cinsîye bi hawayo dejin û nêrehet bena. Lîteraturê weşîya cinsî de na rewşe ra vajînît êno vatene.

**Baş o, ma camêrdî ?**

Înan de rewşe cîya ya: Sey ankîsîyeteyê performansî, tersê serkewtenêbîyayîşî, performansê xo ra emînnêbîyayîş, problemê rew reyayîşî, kêmî yan zî zêdebîyayîşê hormonê tîroîdî, nêweşîya epîlepsîyî, taybîyayîşê hormonanê cinsîtîye, tayê îlacê psîkoz û tansîyonî, goreyê xeyalan nêbîyayîşê cuya seksî tayê sedemî estê ke camêrdan seksî ra dûrî fînenê.

Helbet ma ganî xo vîr ra nêkerîme ke streso kronîk, rincanîye (qefilîyayeyî), depresyon, lîbîdo ser o tesîro xirab kenê û no zî beno kêmbîyayîşê waştişê seks kerdene.

# Mukaddîmet-ûl Îrfan û M. Mîhrî Hîlav

SEÎD VEROJ

**MUKADDÎMET-ÛL** Îrfan, kitabo yewin o ke fonetîka ziwanê kurdî ser o ameyo nuştiş û serra 1918î de Îstanbul de çap bîyo. Goreyê nê kitabî ziwanê kurdî eslê xo de di qismî yo: kurdî û goranî. Goranî zî xo mîyan de beno di qismî: hewramî û zazayî. Nuştoxê kitabî Mehmed Mîhrî yo ke bi mehlasê "M. M." nûşto û bi eslê xo Sineyij o. Sine, yew bajarê rojhelatê Kurdistanî yo. Verê ke ez nê kitabî, bi şima bida şinasnayîş, wazena biney behsê Mehmed Mîhrîyî bika.

Mehmed Mîhrî; lajê Milla Evdilayê Milla Mehmûdê Deşîyijî yo, o zî tornê Mizaferxanê Ciwanroyijî yo. Maya ey zî kênaya Seyîd Şehabeddînê Talsî ya. Keyeyê înan yew keyeyo giragirê mintiqaya Ciwanro yo û înan ra vanê keyeyê "Miftîzade"yan". Goreyê vatişê lajê eyê Seleheddîn Hîlavî: "Mehmed Mîhrî Beg, serra 1885î de bajarê Sine de ameyo dinya, tehsîlê xo yo verên Sine de kerdo û domanîya ey heta 17 serran uca de vîyarta." Uca de medresaya înan bîya û tehsîlê xo yo verên zî a medresa de kerdo. M. Mîhrî, sereyê serra 1900î de mintiqa Ciwanro terk keno, verê şino mintiqa Hewlêrî de tehsîlê xo dewam keno û tira pey zî verê xo dano ver bi mintiqa Serhedî û yeno Wan. Wan de medreseya Xorxor de tehsîlê xo dewam keno û Milla Seîdê Kurdî zî uca ra şinasneno. Sereyê serra 1911î de, Wan ra verê xo dano Îstanbul û di (2) serrî zî Medresaya Fatîhî de tehsîlê xo dewam keno û ey ra pey serra 1912î de eynî ca de beno dersîamê medresa. Wexto ke bîyo 33 serreyî, bi Şazîye Xanima kênaya mamûseyê xo ra zewicîyeno. Zewacê înan ra; di lajî û hîrê kênayî benê. Vatişê S. Hîlavî gore, M. Mîhrî wexto ke tirkî musayo vîst (20) serreyî bîyo.

M. Mîhrî ke şino Îstanbul, uca de gelek şagirt û ciwananê kurdan şinasneno, bi înan ra têkilîya xo xurt keno û keweno mîyanê koma kurdperweran. Beno xebatkarêko aktîf yê Cemiyeta Hêvî, nuştoxê Rojî Kurd û Hetavî Kurd beno. Wexto ke xebata Cemiyeta Hêvî yena betalkerdiş û Şerê Yewin ê Dinya dest pêkeno, M. Mîhrî, bi teşwîq û paşgirîya Babanzade Îsmaîl Heqî, Darûlfûnun de dest bi wendişê Kolejê Huqûqî keno û serra 1921î de wendişê xo xelisneno.

Wexto ke Şerê Yewin ê Dinya qedîya, serra 1918î de xebata kulturî û sîyasî ya kurdan reyna dest pêkerd, Cemîyeta Tealîya Kurdistanî ronîya. M. Mîhrî hem beno aza û xebatkarêko aktîf ê cemîyet û hem zî karê nuştişî domneno. Kitabê Mukaddîmet-ûl Îrfan zî serra 1918î de bi kilmnuşteyê nameyê xo "M. M." nuseno.

Cerîdeya Kurdistanî; Cemîyeta Tealîya Kurdistanî serra 1918 de ronîyaye û 30ê menga/aşma kanûna serra 1919î de, dest bi neşirkerdişê cerîdeya (kovara) "Kurdistan"î kerd. Wayîr û mesûlmudirê kovara Kurdistanî M. Mîhrî yo û serenuştoxê aye zî Arwasîzade Mehmed Şefîq o. Na kovare hewte ra rey çap bîyêne, ziwanê nustişê kovare kurdî û osmanî bî labelê mîyanê rîpelanê aye de nûşteyê ke bi ziwanê farisî û erebî nusîyayê zî ameyê çapkerdiş. Pelê verênî yê humara yewine ser o wina ameyo nuştene: "Sîyasetî ra teber behsê her mewzûyî beno, nuşteyê bi heme ziwanan çap benê û kovarêka hewteyane ya." Pelê verênî yê hûmaranê 8 û 9. ser o zî wina ameyo nuştiş: "Kovarêka fikrî û xoser a sîyasî, komelayî, edebî û îlmî ya, hewte ra rey neşir bena." Cayê çapkerdişê aye, bajarê Îstanbulî bî. Ewro ma baş nêzanê ke na kovare pêsero çend humarî ameya neşirkerdiş. Hûmara peyên a kovara "Kurdistan"î ke ma dest de esta, hûmara desûhîrêyin (13.) a. Mamuse Kemal Mazhar vano: "Hûmara peyên a ke mi dîya, hûmara newêsin (19.) a û pelê ayê verênî ser o tarîxê "7ê Receba 1338 (1920) û serra didine" ameyo nuştiş.

Semedo ke kovara Kurdistanî sey yew organê Cemîyeta Tealîyê Kurdistanî (bi kilmnuşteyê kurdî û tirkî: CTK/KTC) ameya neşirkerdiş, bêguman sîyasetê aye zî girêdayeyê sîyaset û armanca CTK bî. Wexto ke ma bala xo bidê nuşte û munaqeşeyanê mîyanê rîpelanê aye, winî dîyar beno ke cerîdeya Kurdistanî bîya wasîteyêka zaf muhîm a averberdiş û vilakerdişê fikrê mîllî yê kurdan. No xusîsiyetê aye, yew raportê C. L. Woolleyê (FO 371/4191, 10ê Temmuza 1919) qumandarê îngilizan de winî ameyo dîyarkerdiş: "Cerîdeya Kurdistanî neşrîyatêko millî yo û hewte ra rey neşir beno."

M. Mîhrîyî, karê nuştişî de mehlasê cîya-cîyayî xebitnayê û bi îmzayanê sey "M., Mîhrî, M. M., Mehmed Mîhrî, Kakeheme, Dawer Erdelanî, Binî Erdelanî, Zehawî Zade, Av. Mehmed Mîhrî" nuşto. Cumhurîyetî ra pey, wexto ke "qanûnê peynameyî" vejîyeno, M. Mîhrî zî peynameyê "Hêlav-Helav-Hîlav"î gêno. Kitabê eyê ke wextê cumhurîyetî de neşir bîyê, bi peynameyê "Hîlav"î ameyê nuştiş. M. Mîhrî, 73 serran mîyan de hişê xo dayo doza milleta xo û qelama xo seba milleta xo heriknaya, mewzûyanê cîya-ciyayan ser o gelek nuşteyî nûştî; derheqê ziwan, edebiyat, şiîr û tarîxî de meqele û kitabê ey ameyê çapkerdiş.

***

Mehmed Mîhrî entellektuelêko muhîm ê milleta kurdî yo; bi îlm û îrfanê xo, vîr û qelema xo ya tûnde bîyo çiraya roşnayîya raya milleta kurdan. Ey, bi fehm û feresat û dîmaxa xo xizmetê milleta xo kerdo. Gelek nûşte û eserê erciyayeyî dîyarîyê ma kerdî; qismêkê înan sey meqale ameyê nustiş û qismêk zî sey kitabî ameyê çapkerdiş. Gelek meqaleyê nûştoxî kovaranê sey Hetavî Kurd, Jîn, Kurdistanê, Hetavî Hewlêr, Dîcleya Musa Anterî de ameyê neşir kerdene. Kitabê ey zî; tayê wextê Împaratorîya Osmanî de û tayê zî dewrê cumhurîyetî de ameyê neşir kerdene. Mewzûyê nê nuşteyo ke şima ver de yo, kitabê ey Muqeddîmet-ûl Îrfanê yo. Hecmê nê kitabi qij/qiçek bo zî, mewzûyê ey seba ziwan û xebatanê dîyalektolojîya kurdî zaf muhîm o.

Muqeddîmet'ûl Îrfan; çapbîyayena yewinî ra pey, reya verênî bi tirkîya ewroyine û kurmancîya bi alfabeya latînî malpera Kovara Bîr de ame vilakerdiş. No kitab pêsero 17 rîpelî yo û vatişê nuştoxî ra winî aseno ke sey vateyê dest pêkerdişê xebata lûgatê "Îrfan"î ameyo nustiş. Malesef heta ewro zî lûgatê "Îrfan"î nêkewto ma dest, lazim o ke ma pêro bala xo bidê nê eserî ser û seba xodestvistişê lûgatê "Îrfan"î bixebitîyê.

Karê neşir kerdene û vila kerdena kitabê Muqeddîmet-ûl Îrfan, terafê Arwasîzade Seyîd Mehmed Şefîqî ra ameyo kerdiş. Humaranê 2, 3 û 4. ê kovara Jîn de derheqê nê kitabî de îzehatêko winasî ameyo vilakerdiş: "Heqê qeydeyanê lûgatê ziwanê kurdî de bi nameyê Muqeddîmet-ûl Îrfan, yew rîsala ameya neşirkerdiş. Şima şênê na rîsala, îdarexaneyê ma û dikanê Hemdî Efendî yê Sehafî ra temîn bikê. Cayê dikanî, Şehzadebaşî de nêzdîyê Şirketa Koperetîfî yo."

Goreyê zanayîşê mayê ewroyinî, kitabo yewin û sereke yo ke derheqê fonetîk û lehçeyanê ziwanê kurdî de ameyo nustiş, Mukaddimet-ûl Îrfan o. No kitab bend bi bend ameyo nustiş û pêsero 140 bendî yo. Mehmed Mîhrî sebebê nustişê nê kitabî wina îzah keno: "Ez şêna îqrar û îtîraf bika ke milleta kurdan hetê îlm û îrfanî ra, bi hawayêko eşkera heme milletanê bînan ra zafêr mehrûm menda û no sebeb ra zî apey menda, nêşêyayo aver kewa û gird biba.

Mîyanê nê qewmî de zaf mêrdimê wayîrê fezîletî û belkî tayê dahî zî bîyê û bîlfiîl zî estî, feqet nişênayo xizmetê ke lazim î bikerê. Labelê nê mêrdiman tayînê rê gelek xizmet kerdo û seba nê xizmetan zî, teşekûr û tebrîkî teqdîmê înan bîyê. No sebeb ra, ez wazena na beyte sey dîyarîyêk teqdîmê înan bika: *Ayê ke wayîrê fazîletî bibê û fazîletê xo nîşanê qewdê xo nêdê û înan ra bilimnê, hem îtimat bi ê kesan nêbeno û hem zî înan ra lomeyî benê."*

Bêguman nuştox yew het ra rexne û lomeyanê xo keno û heto bîn ra zî behsê xebat û şexsîyetanê xo ra ver keno û xusûsen derheqê xebatanê ziwanê kurdî de wina vano:

"Xebatê ke ameyê kerdene pêro neşir nêbîyê û halê îstîfadekerdişî de nîyê. Êyê ke mi eşnawitî; wezîrê malîyeyê Îranî, Hecî Faxrûl Memalîk ê hikumdarzadeyê Benî Erdelan, qeyde û gramerê kurdî ser o yew kitabê mukemele nuşto û dayo çap kerdene. Nê kitab, 30 serrî verê bîyayîşê mi (texmînî 1850-55) ameyo neşirkerdiş, ez Kurdistan de qet raştê nusxayêk ey nêameya û derheqê nê kitabî de zî zanayîşê mi çin o. Labelê her halûkar de, hewce yo ke ma seba nê muteşebîsê alîmane yê yew esilzadeyî sey Hecî Fexrûl Memalîkî mûteşekîr û halweş bibê."

Mehmed Mîhrî dewamê nuşteyê xo de, derheqê çinbîyayîşê xebatêka serûverê tarîx û gramerê kurdî zî, sey yew kêmaneya zaf girde qebûl keno û vano: "Ziwanê kurdî, bi na şîrînayî û nazikîya xo ya, ne wayîrê yew qewaîdî yo û ne zî kitabê ey estî. Komelê kurdan zaf kevnar/kehen o û nîsbetê ey zî vêşî yê, lakim tarîxêkê înan o tekûz çin o... Eger kurdî yew qewaîd bîyarê meydan, mecburê musayîşê yewna ziwanî nêbenê û ziwanê înan zî vindî nêbeno."

Goreyê nê kitabê ziwanê kurdî, eslê xo de di qismî yo: kurdî û goranî. Goranî zî xo mîyan de bena di qismî: hewramî û Zazayî. Teşkîlatê îdarî yê ê wextî gore, cayê ronîştiş û vilabiyayîşê "zaza"yan zî winî ameyo nîşankerdiş: Zazayî, bajaranê sey Erzirom, Azerbaycan, Xarpêt, Dîyarbekir û qismêkê wîlayetê Bidlîsî de ronişenê.

M. Mîhrî amancê nustişê kitabî wina dîyar keno: "Amancê nê kitabî weçînayîş, pêgirewtiş û raştkerdişê ziwanê kurdî yo, nêke vilakerdiş û cêrakerdiş o. Mi seba fayedeyêko umûmî dest bi nûstişê nê kitabî kerd. Faydeyo ke nê kitabî ra peyda bibo, her kesî ra vêşêr ê milleta Kurdî yo. Çimkî mîyanê unsuranê Îslamî de, îhtiyacê kurdan heme kom û taîfeyan ra vêşêr bi awa heyatî ya îlim û îrfanî esta, îhtiyacîya înan heme unsuran ra vêşêr bi perwerdeyî û tedrîsatî esta. Qandê ke no xizmeto îlmî, eynî wext wezîfeyêko muqades û muhîm ê îslamî yo zî, ez bi munasebetê destpêkerdişê na xebata ke behsê aye beno, keyfweş û sereberz a."

Dewamê nuşteyê xo de behsê mewzûyê kitabî keno û derheqê fonetîka kurdî de wina vano: "Na xebate de, bi bedilîyayîşê vengan ra girêdaye, o do tayê destûrê muhîm û esasî yê ke bedilîyayîş û açarnayîşê mana û virazîyayîşê vateyanê ziwanê kurdî bêrê nîşan kerdene û arzê balkêşîya wendoxan bibê.

Hetê yewbîyayene, terz û şêweyan ra maddeten biney cîyayî mabenê ziwanê qebîle û eşîretanê kurdan de bibo zî, êyê ke weqfê nê qaydeyan bibê, şênê ziwanê kurdî rind fam bikê. Wexto ke nê qayde û destûrî yenê dîyar kerdene, gerek ma bi balkêşîye û bi fehmêko durist, bê waswase û şaşîye bi terz û şêweyê zelal ê ziwanê qebîle û eşîretan bigeyrê û îdraq bikê. Îhtilafê mabenê nê şûbe û beşan, tena şeklî yo û bi girêdayeyê şêweyê înan o. Mahîyet û maddîyetê înan de qet ferqêk çin o. Senî ke roj bi porijine nêlîmyeno, mutleqa raştîya na mesela zî do rojî eşkere bibo."

M. Mîhrî, nê eserê xo de, derheqê elîfba û herfanê ziwanê kurdî de zî fikrê xo eşkera keno û seba nûştişê ziwanê kurdî 32 herfan dîyar keno. *"Herfê ziwanê kurdî:* A, B, P, T, S, C, Ha, X, D, Zal, R, Za, J, Sin, Ş, Sad, Ti, Ze, Eyn, Xeyn, F, V, Q, K, G, L, M, N, W, H, La, Y." Dewamê nuşteyî de vano: "Eslê xo de herfê "s", "zal" û "sad" a ke bi sereyê ziwanî yenê wendiş, ziwanê kurdî de çin ê. Labelê ma zanê ke ziwanê erebî bi maddî û manewî tesîrêko giran bi ziwanê qewmê misilmanan kerdo. No semed ra herf û vengê corênî kewtî mîyanê ziwanê kurdî zî û yenê xebitnayîş.

Tayê nimûneyê vengbedilîyayîşê ziwanê kurdî zî wina ameyê dîyarkerdiş:

*"Vengê B:*

1- No veng, seba sivikbîyayîşê vateyan, ge ge cê ra keweno. Mîsal: "Seyrî bike/seyrî ke, biwace/wace".

2- Îşaretê raweya fermanî yo. Mîsal: "Bêje", "bilê", "biwace".

3- Agêreno herfa "w"yî ser. Mîsal: "ba/wa, xerab/xeraw".

*Vengê X:*

4- Eke herfa vernîya vateyan de bêro, ge-ge keweno. Mîsal: "Xwarden/wardî, xoten/wetî".

*Vengê Ş:*

5- Wezîfeyê zemîrê pêrabesteyî vîneno û cayê zemîrê limitî de yeno xebitnayîş. Mîsal: "Kerdiş, watiş".

6- "Ş", Zazakî de qertafê (cidarê) mesdarî yo.

*Vengê W:*

7- Bi vengê "v"ya bedêlyeno. Mîsal: "Çaw/çav, aw/av".

*Vengê Î:*


8- Bêro peynîya vateyan, mana pirrbîyayene dano înan. "bize/bizî, wele/welî".


Mehmed Mîhrî bi na xebata xoya esasî û erciyaya, yew gama zaf muhîme eşta û bîyo verikê wareyê xebatanê ziwanê kurdî. O, wareyê xebatanê ziwanzanîye de, krîtîkêko balkêş kesanê verê xo ser ro keno û vano: "Înan hewcedarîya mesulîyetîya xo nêarda ca, ez bi nê kitabî bîya verikê xebata na seha. Mi na xebate de hiş, vîr, dîqet, xezîneya xeyalan û pelanê fikrê xo ra teber yew çime nêdî ke bişêna murecatê ey bika, vînayîş zî qethen mimkun nîyo. Mealesef halê ma no hawa yo, lakim no hal nêbî sebebê sistî û bêumudîya mi, bîlakis seba xebat û cîddîyeta mi, bî tesîrêko tewr muhîm."

M. Mîhrî peynîye de, xebata xo bi di rêzikandê yew şaîrî qedênayo û vato:

*"Bi roşnayîya xo şina rayîrê eşqî de,*
*Eger raşnayîya to ra nêbo, çilaya xatirî rayîrê to roşin nêkena."*






Mukadîmet-ûl Îrfan, kitabo yewin o ke fonetîka ziwanê kurdî ser o ameyo nuştiş û serra 1918î de Îstanbul de çap bîyo. Goreyê nê kitabî ziwanê kurdî eslê xo de di qismî yo: kurdî û goranî. Goranî zî xo mîyan de beno di qismî: hewramî û zazayî. Nuştoxê kitabî Mehmed Mîhrî yo ke bi mehlasê "M. M." nûşto û bi eslê xo Sineyij o.

Lîzbonê:

# Bajarê Spî dîroka reş

ŞEFÎQ PÊŞENG



**NIFŞÊ** me navê Portugalê bi saya gogbaz Eusébio da Silva Ferreira bihîstibû. Eusébio bi eslê xwe ji Mozambîkê bû, Mozabîk jî mêtingeheke Portugalê bû. Bernavkê wî jî 'Pilingê reş' bû. Eusébio li Lîzbonê li gel Benfica Lîzbonê û jî bo taxima netewî ya Portugalê dileyîst. Niza gelo dema Eusébio bi formaya alaya welatekî dagirkerê welatê wî li ser sîngê, dileyîst çi hîs dikir? Lê dilîst û diyar bû ku ev rewş ji aliyê gelek hogirên wî yên li welatê wî nedihat qebûlkirin, ne xema wî bû.

Portugala di ciwaniya me de jî bi dîktator Salazar, şerê Angalo û Mozabîkê yên rizgariyê û romana Alvaro Chunhal ya bi navê 'Li Portugalê spêda azadiyê' di hişê me de cîh girtibû.

Hizrên min yên derbarê portugaliyan ne zelal bûn. Li aliyekî Salazarê faşîst, Portugala li Afrîkayê dagirker û li aliyê din portugaliyên di Nîsana 1975'an de bi şêweyeke mucîzevî şoreşa qerenfîlî pêk anîbûn û him Portugal ji rejîmeke faşîst û him jî gelek welatên mêtingeh ji mêtingehkariyê rizgar kiribûn.

Min di nava van hizrên tevîhev de, portugalî cara pêşî li Almanyayê nas kirin. Pêşiyê li festîvalan, paşê di karûbarên komelê de. Di dawiya salên 1990'î û destpêka salên 2000'î de Komela Civata Kurd, Civata Yûnaniyan û komeleke Portugaliyan ku komeleke werzişî bû, cîranê hev bûn. Loma jî em gelek caran rastî hev dihatin, me silav li hev dikir, li hal û xatirê hev dipirsî. Portugalî rojên ku leyistikeke gogê hebû, bi jin û zarokên xwe dihatin komelê, him bi hev re xwarin dixwarin û him jî li leyistikê temaşe dikirin. Carekê jî min bi wan re li leyistikeke Portugalê temaşe kiribû. Piştî her golê weke ku min gol avêtibe, ez jî maçî û himbêz dikirim.

Li hêviya derfetekê bûm ku rojekê biçim bajarê Eusébio lê fûtbol leyistibû, li leyistikeke fûtbolê temaşe bikim, di êvareke ji rengê behrê de li Fadoyê guhdarî bikim, navrojekê 'fîesta' bikim û axirê her sê Fiyên desthilatiya Salazarî li ser niga dihiştin, nas bikim.

Bajarê lê dijîm Koln bi gelek taybetmendiyên xwe navdar e. Karnavala wê jî navdar e. Bi sedhezaran kes ji dervayî Kolnê tên Kolnê. Di hefteya Karnavalê de 'bêhna mîza hespan' ji Kolnê difûre, 'gunehkarî' zêde dibe, kûçe û kolan bi sermestan mişt dibin. Ji gunehkariya van çend rojan, neh mehên din gelekên wan 'bavnenas' bi sedan zarok ji dayik dibin.

Di van salên dawî de em di karnavalê de diçin devereke din. Hedefa me ya vê salê Lîzbon bû. Hesteke xweş e ku meriv bêyî tirs, pirs û rawestandinê tixûbên dewletan derbas bike. Ku em li Lîzbonê daketin, kesî tiştek ji me nepirsî, ji xwe me kes nedît û kesî bixêrhatin jî li me nekir.

Paytext navendên siyasetê ne, hinek jî nîşan û kelehên zilmê û serdestiyê ne. Hemî biryarên girîng li wan tên wergirtin. Sitemkar, desthilatdar li wan kar û barên xwe dimeşînin, li wan 'meşka xwe li dar dixin'. Xwîntal in, tamsar in mirûzkirî ne. Rûçikê Brejnev tînin bîra meriv. Lîzbon jî bi qasî Berlînê, Londrayê, Madrîdê, Romayê Anqera, Şam, Tehran û Bexdayê gunehkar e. Stratejiya şerê bi armanca jidestneda sîstema mêtingehkar ku Portugaliya ji vî şerî re Guerra do Ultramar -şerê li paş deryayê gotiye, li hemberî Mozambîkê, Gîneyê, Angolayê, li vî bajarê spî hatibû çêkirin. Ji bo parastina sîstema mêtingehkar herî zêde vî bajarî nigê xwe li erdê xistibû. Dîroka reş ya mêtingehkariyê li vî bajarî hatibû nivîsandin.

Bajar li ser Çemê Tejo ye, li ser heft giran ava bûye û li qiraxa deryayê ye. Deriyê dawî yê Ewropayê ye, jê wê de av e û heta Amerîkayê av e. Min hêvî dikir bikaribim bibêjim ku Lîzabon weke paytexta dewleteke mêtingehkar ji dîroka xwe ya reş fedî dike. Lê di rastiyê de dema meriv li bajêr digere, dibe şahidê gelek nîşan û diyardeyên ku di dîroka vî bajarî de milîtarîzm serdest bûye. Navên gelek meydanan navê generalan e, gelek peyker û monument ên eskeran e. Eger meriv bikaribe dîroka keç û lawên vî bajêrî îro jê neberpirs in, deyne aliyekî, Lîzabon bajarekî delal e, berêvaran delaltir dibe, bi şev bi awazên Fado û bêhna meyê dibe bajarekî efsûnî. Jê re Bajarê Spî tê gotin lê rengareng e, hemû tonên payîzê li yek kuçeyekê dikarin derkevin pêşberî we. Di hûrguliya her kûçe û meydanekê de sirek veşartî ye.

Derketina kaşkaşokên wê, fitlonek û pêlikên wê meriv diwestînin. Lê piştî her fitlonekê barek, xwaringehek, pastaxaneyek an qehwexaneyeke derîvekirî li benda meriv e. Êvaran ji her kuçeyekê awaza Fadoyê bilind dibe. Li wê fêrbûm: Fado ji fatuma latînî tê. Wateya wê jî qeder e û ji taxa feqîriyê, ji devê jinên laşfiroş belav bûye. Belkî sedema hizn û dilbikeseriya wê jî ev be. Ku li xwaringehekê an barekê, navdar, nenavdar hunermendek dest bi stranekê kir, êdî kes nema xwarinê dixwe, ji cîhê xwe ranabe mêvanên dixwaze derbasî hundir bibe jî heta stran neqede li ber derî disekine. Ev yek heta bêhndanê dom dike.

Kuçeyên bajêr teng in hin jî wan bi qasî ere-be nikarin têkevin wan teng in. Dişibin kuçeyên Diyarbekir û Mêrdînê, lê ji sebeb, kaş û pêlikên xwe bêtir dişibin yên Mêrdînê. Tramvayên dîrokî ku her yek vagonek e û dor 20-25 rêwî dikarin li wan siwar bibin, weke gêriyan di wan kaşan de, ehlê bajêr digihînin malên wan, mêvanan jî digerînin. Li bajarê kevn kuçe, kolan, meydan û rêyên peyayan tev ji keviran e. Destdariya seramîk li vî bajarî bi nav û deng e, loma jî dîwarên derva yên gelek xaniyan û dîwarên hundir yên gelek xwaringeh, pastaxane û baran bi seramîkan xemilandî ne.

Ji xwarinan masiyê di nava xwê de ziwakirî-Bacalhau- navdar e. 160 cûre xwarin jê tê çêkirin û helbet, xwarinên ji masî û ajalên deryayê û pasta wan ya bi navê Nata.

# Koma Kurmancî civîna xwe ya 60. li Zaxoyê li darxist

BENGÎ BAWEŞAN



**JI** bo parastin û nûjenkirina Kurdî hin hewl û xebatên cur bi cur hene. Koma Kurmancî ya Enstîtûya Kurdî ya Parîsê ev sî sal e bênavber û bi piranî li ser zaravayê Kurmancî dixebite. Xebatên koma Kurmancî bi saya gelek xebat û lêkolînên zimanzan û pisporên Kurd dimeşe.

Kom bi vexwendina Zanîngeha Zaxo ya Herêma Kurdistanê di navbera 14 – 21'e Gulanê de civîna xwe ya 60. lidarxist. Me li ser navê Rojnameya Basê bi zimanzan Dr. Lezgîn Çalî û zimanzan- rexnegirê edebîyatê Dr. Fazil Omer re derheqê civîna 60. a Koma Kurmancî ya ku xwedî tecrûbeya sî salî ye û girîngiya van xebatan axivîn

Zimanzan Lezgîn Çalî amaje dike ku xebata Koma Kurmancî ya ku ya sî sal e bênavber didome, bo wan bi qîmet e û hêvî dike ku di karên komxebatî yên ji vir şûnde de jî bi ser kevin. Çalî diyar dike ku wek her carî bi heman motîvasyonê ew civîna 60. a li Zaxoyê li dar xistine û lê zêde dike ku ji ber lidarxistina civîna 60. kêfxweş in.

Çalî dibêje koma Kurmancî salê du caran, di bihar û payîzê de, dicivin. Çalî wiha behsa civînên komê dike, "Peyvên ku hatine amadekirin, berhevkirin têne pêşkeşkirin. Li ser van peyvan nîqaş û axaftin çêdibin û peyv têne qeyd kirin. Herî dawî an ev peyv têne pejirandin an jî nayên pejirandin."

Çalî destnîşan dike ku di civîna 60. de jî li ser gelek mijar û peyvan axivîne. Çalî dibêje wekî çend cîvînên din, di civîna dawî de jî derheqê termînolojiya tibî (bijîşkî) de xebatên wî çêbûne.

Tê diyarkirin ku wekî civînên din yên komê, di civîna 60. de jî li ser gelek mijar û peyvan nîqaş û axaftin çêbûne û naveroka civîna dawî wiha hat ragihandin; hin peyvên bi balindeyan ve girêdayî, termînolojiya bijîşkî, ji ferhengoka Brîfkanî, ji ferhengoka Jaba, hin peyvên kêmnas/nenas, Devoka Berrîyê / Kulavçêkirin, ji Dîwana Ehmedê Nalband..

**Peyvên li ber jibîrkirinê ne tên nivîsandin**

Çalî, dibêje armanca sereke ya koma wan ew e ku peyvên li ber jibîrkirinê ne berhev bikin û binivîsin. Çalî amaje dike li Kurdistanê ji ber ku jiyana gundan kêm dibe û jiyana bajarvanî zêde dibe peyvên ku difikirin ku ew li ber jibîrkirinê ne yên gelek cureyên navên giya, ajalan berhev dikin, tevî navê wan peyvan navê wan ê zanistî jî dinivîsin.

Çalî, destnîşan dike ku hemû civînên ku heta niha hatine li darxistin yeko yeko wek bultenên 4-8 rûpelî hatine çapkirin. Pêşî biqasî 20 civîn ji aliyê weşanxaneya Apecê ve paşê jî 40 civînên din ji aliyê weşanxaneya Avestayê ve hatiye çapkirin. Çalî dibêje; dixwazin û plan dikin ku wê 60 civînan bi hev re çap bikin

> Koma Kurmancî ya Enstîtûya Kurdî ya Parîsê ev sî sal e bi piranî li ser zaravayê Kurmancî xebatan dike. Di komê de gelek zimanzan û pîsporên Kurd lêkolînan dikin. Civîna 60. ya Koma Kurmancî li Zanîngeha Zaxoya Herêma Kurdistanê hat li darxistin.

Li ser pirsa me ya "gelo hûn têkiliyên di navbera sazî, dezgeh û zanîngehên Kurd yên derbarê zimên û çandê de çawa dibînin" Çalî wiha bersiv da:

"Hê toreke birêkûpêk yê organîzasyonê tune ye, pir caran dengê sazîyên Kurd nagîhêje cihên bi bandor. Heta niha zanîngehên Kurdistanê bi karê akademiyê re mijûl bûn, Ez vê gavê ne di wê baweriyê de me ku zanîngehên Kurdistanê bi organîzasyonên bi bandor li ser Kurd û Kurdistanê tesîrekê çêdikin. Heta em dibînin carinan çapemenî ji zanîngehan zêdetir bi bandor in."

**"Divê ev xebat li Kurdistanê bên sazkirin"**

Zimanzan û rexnegirê edebîyatê Dr. Fazil Omar jî diyar dike ku armanca xebatên koma Kurmancî parastin û aktûelkirina zimên e. Omar dibêje civînên komê yên heta niha li derveyî Kurdistanê hatibûn kirin lêbelê ev çend civîn in li Herêma Kurdistanê tên lidarxistin. Omar amaje dike ku kom ji kesên dildar pêk tê û endamtiyeke berdewamî tune ye.

Omarê ku hêviyên xwe yên di derbarê xebatên komê de tîne ziman dibêje ku hêviya me ew e ku Rêveberiya Herêma Kurdistanê û sazîyên elaqedar yên Dihokê xebatên koma Kurmancî li Dihokê saz bikin û wisa berdewam dike,

"Li gorî min ji bo ku ev xebat bibe xebateke xwemalî divê ev kom li Kurdistanê bibe xwedî dezgeh û sazî. Her sal ji her perçeyên Kurdistanê zimanzan û pispor bên li Dihokê bicivin û vê xebatê pêş de bibin."

Fazıl Omar dibêje di civîna koma Kurmancî a Zaxoyê de ji bilî xebatên li ser ziman çend çalakiyên din jî hene. Omar dibêje Serokê Enstîtûya Kurdî ya Parîsê Kendal Nezan jî bo van çalakiyan li Zaxo ye.

Li aliyê din kesên ku beşdarî civîna 60. bûne ew in; Reşo Zîlan, Ziya Avci, Têmûrê Xelîl, Hemîd Kilicaslan, Mistefa Aydogan, Lezgînê Çalî, Emîn Narozî, Zinar Soran, Rênas Awdal, Salam Numan, Newzad Hurîrî,

Her wisa mêvanên ku alîkariya karê koma Kurmancî dikin jî ew in: Eyub Sînan Kiran, Ahmedê Dirihî, Îsmaîl Taha Şahîn, Fazil Omer.




Koma Kurmancî ku salê du caran dicive. Him peyvên jibîrbûyî yên zaravayê Kurmancî berhev dike û bi navê wan ê zanistî dinivîse him jî zimên nûjen dike.

Efsaneyên Afirîneriyê

# Dema Çira Pê Ketin



CIWANMERD KULEK

**WÊJE**, literatur, cîhana afirîneriyê, alema fikr û xeyalan –bi hemû navan lê ne bi ti yekî – wek deryayeke bê serî û bê binî ye. Ne tenê ji alî gerdûna tê afirandin di berhemên vî warî de, lê her wiha ji alî gerdûna ku ev berhem bi xwe tê de tên afirandin jî. Çîroka me a bi van berheman re ji deqeya ku em dest bi dîtin, guhdarîkirin yan xwendina wan dikin dest pê dike. Lê a afirînerên wê gelekî ji berî wê de dest pê dike û, belkî, bi me re diqede. Em carina ji kûçe û kolanên di romanekê de, ji pîlana bajarekî a di çîrokê de hez dikin, carina ji straneke di wan de. Lê carina kûçe û kolanên, pîlan û meselên di wê berhemê de tine ne, lê di pêvajoya avakirina wê de hene dibin armanca hezkirina me. Û em bi pey pirîskên van çîrokên çîrokan dikevin... Vê hefteyê di keşkûla me de sê gewreyên cîhanê û sê gewherên ku ji me re hiştine, bi pirîsk û çirûskên ku wan ronî nekin jî belkî ew pêxistibin li rûpelê me ne. Her wiha Mario Beneditti, helbestkarê eşq û evînê ê Ûrûguayî, helbesteke xwe bi kurdî ji we re dinuhurîne û dixwaze em tîna helbestê ji jiyana xwe kêm nekin. Café-rûpela me amade ye û herçî muzîk e her kes bi dilê xwe ye. Xwendineke xweş û hefteyeke tije xwendin ji bo we...




## EVÎNA BER ÊVARÊ

Mixabin tu ne li nik min î
gava li demjimêrê dinerim û saet çar e
lîsteyê diqedînim û deh deqeyan difikirim
û lingên xwe vedizelînim weku her êvar
û serçengên xwe jî wusa da ku nerm bibe pişta min
û tilî li min duta dibin û ez wan li virê diqelipînim

Mixabin tu ne li nik min î
gava li demjimêrê dinerim û saet pênc e
û niçikek e ku berjewendiyan dihesibîne
yan du dest in ku rikêfî çil bişkokan dikin
yan guhek e ku dibihîse çawa telefon dizire
yan remzek e hejmaran pêk tîne û ez wan li rastiyê digerînim

Mixabin tu ne li nik min î
gava li demjimêrê dinerim û saet şeş e
dibe ku ji nedî ve nêzîkî min bibî
û bibêjî "çawa yî?" û em bimînin wusa
ez bi lewta sor a lêvên te
tu bi teniya şîn a karbona min

Mario Beneditti






## Immanuel Kant – *Rexneya Aqlê Xwerû*

Fîlozofê Elman Immanuel Kant dema rexneyên David Hume ên li metafîzîkê xwendin, ket nav pirsên ku dê paşê felsefeyeke mezin ji wan derxistaya. Hume mînakeke hêsan dida: Em bibêjin du topên bîlardoyê hene, yek tê li a dî dikeve û evêya duyem bi gerr dikeve. Ji ber ku ev tecrûbe dubare dibe, em dibêjin qey sebeba tevgera topa duyem topa yekem e û bi vî rengî hizreke sedem û akam (encam)ê bi me re çêdibe. Kant dê piştre bandora vê hizra Hume a li ser xwe wiha bi zar ve bikira: "Hume ez ji xewa min a dogmatîk hişyar kirim." Yanzdeh salan goşegîr bû û di xelwetxaneya xwe de ket behra fikr û hizirînê. Kantê ku di tevahiya jiyana xwe de kêm caran ji bajarê xwe, Königsberg, derketibû, vê carê jî di mala xwe de hesarge dibû. Lê dema derket pelên yek ji kitêbên herî girîng ên dîroka felsefeyê di bin çengê wî de bûn: *Rexneya Aqlê Xwerû*. Kant hizirîbû ku şikên ku Hume anîbûn ziman encax bi aqil bihatana jinavbirin û di encamê de konseptên a priori (pêşîn) ên di hişê me de dîtin. Nexwe, bi dîtina wî, konseptên weke sedem û akamê jî tê de, gelek têgeh hebûn ku ew ji azmûn û tecrûbeyên mirovan nedizan, lê azmûn û tecrûbeyan ew piştrast dikirin û rasteqîniya wan diselmand. Kant duwanzdeh konseptên wiha li ser çar kategoriyan diyar kirin û hişmendiyeke nû li ser têgihiştina cîhanê pêşkêşî me kir.

Wê rasthatina ku xew li Kant herimand yek ji berhemên herî girîng ên dîroka felsefeyê, *Rexneya Aqlê Xwerû*, li pey xwe anî û bû "sebeb" ku aqil bi giraniyeke mezin têkeve navenda fahmkirina me ya cîhanê. Felsefeya ku Platon ruh, Kant aqil xist navê li bende hişyarbûna me ye bo ku rojekê bi kurdî deng vede.





## Gabriel Garcia Márquez – *Sed Salên Tenêtiyê*

Márquezê rojnamevan di Opeleke spî a 1962 model de ji Mexico Cityê diçû Acapulcoyê. Jina xwe û herdu kurên xwe jî bi xwe re dibir bo gerr û geştê. Ji nişka ve di nîvê rê de dîreksiyon zîvirand û berê seyareyê guherand. Dê vegeriyana malê. Ji xortaniya xwe de fikra nivîsandina romaneke bi navê *La casa (Mal)* di dilê wî de hebû lê vê fikra ku ji mala bapîr û dapîra wî di hişê wî de mabû li qelemê nedabû û nerêjtibû ser kaxezê. Fikir roj bi roj di hişê wî de kemilîbû lê deng, awa û newayê ku pê binivîse peyda nedikir. Wê rojê di rê de her tişt jê re eyan bûbû û wî ewrê şolî ji nişka ve ji ser wê fikra xam dabû alî û nava serê wî zelal bûbû. Piştî ku gihaştin Mexico Cityê Márquez seyareya xwe firot, pereyên wê dan jina xwe bo ku mesrefên malê pê bide û di odeyeke piçûk a malê de derî li ser xwe girt. 18 mehan di wê odeyê de, rojê bi şeş pakêt cixareyan, her roj şixulî û ew roman nivîsand. Dema rûpelê dawî ji wê romana bi sedan pelan dinivîsî, bi îlhama ji hevokeke li dawiya wî rûpelî, navê romanê kir *Sed Salên Tenêtiyê*. Piştî ku ji ser rabû û derket, dît ku jina wî gelek eşyayên di malê de firotibûn bo ku pêdawistiyan dabîn bike û bi ser de deynê çend mehan ê kirêya xaniyê wan ketibû ser hev. Bêtalihiya romanê ne yek ne dudu bû. Dema jinika xettat destnivîs dibirin ji bo ku wan ji nû ve û paqij binivîse, kaxez li ber ba û baranê ji destê wê firiyan û li ber baranê herimîn. Roja ku a soxî her tişt temam kirin û nivîskar tevî jina xwe çû postexaneyê ku dosyeyê bişîne ji weşangerê li Buenos Airesê (Arjantîn) re, li wir dîtin ku pereyê wan tenê têra şandina nîvê kaxezan dikir. Rabûn gurza giran a kaxezan kirin du parçe û heqê perçeyekî dan û ew şandin. Piştî ku hatin malê lê warqilîn ku ji dêvla beşê pêşî beşê dawî şandine ji weşanger re. Lê vê romana ku bi bêtalihiyan dest pê kiribû nesîbekî fireh anî hem ji Márquez re hem ji xwendevanan re. Vê kitêba ku li temamê dinyayê, bi gelek zimanan, di ser hev de ji 30 milyonî zêdetir nusxeyên wê hatin firotin li gor hinan piştî kitêbên pîroz kitêba herî meşhûr û heja bû.

Gelo Márquez çawa bi ser şêwaza vê kitêbê û kitêbên xwe yên dî bû, ku bi navê rasteqîniya efsûnî li dinyayê deng veda? Kê ew ji xewa wî hişyar kir û çavê wî li vê kişfa mezin vekir? Çîrok dirêj e lê bersiv kurt e: Kafka. Márquez rojekê Veguherîna Kafka xwend û li hember Gregor Samsayê ku di destpêka romanê de bûbû kêzik şaş û matmayî ma. Çawa tiştekî wiha dibû? "Min heta wê rojê nizanibû ku tiştên wiha mumkin in di edebiyatê de." Piştî ku fahm kir ku nivîskar serbest bû di vegotina tiştên dûrî rastiyê de bi şertê ku wan bike ciyê baweriyê, şêwazê dapîra xwe ê ku her tim tiştên ecêb û nebawerbar bi awayekî micid û rasteqîn digot di bîra wî de hat û heta dawiya temenê xwe li vî şêwazî kudand.





## Marcel Proust – *Li Pey Dema Winda*

"Longtemps, je me suis couché de bonne heure. Parfois, à peine ma bougie éteinte, mes yeux se fermaient si vite que je n'avais pas le temps de me dire : "Je m'endors."" Yek ji romanên herî mezin ên dîroka wêjeyê bi vê gotinê dest pê dike. Vê gotina ku di destpêka cilda yekem a berhema heft cildî a Marcel Proust, *À la recherche du temps perdu (Li Pey Dema Winda)*, wiha dibêje: "Demeke dirêj, ez zûka diketim nav ciyan. Carina, çawa finda ber serê min ditefiya, çavên min ewqas zû dihatin girtin ku min pê re nedigihand ji xwe re bibêjim: "Di xew re diçim.""

Marcel Proust di 1871an de ji dayik bû û di 1922yan de mir. Proust vê rêza kitêban a ku wek berhema jiyana xwe didît di demeke dirêj de nivîsand û piştî xelaskirina nivîsandina dawî di nav ciyên xwe de, nexweş û bêhal, ragihand ku êdî dikare bimire. Temenê wî têrê nekir çapbûna hin beşên Li Pey Demên Winda bi saxî bi çavên serê xwe bibîne. Nexweşiya astimê temamê jiyana wî bûbû bela serê wî, lê dîsa jî wî karibû berhema xwe bi hevokinî wisa dirêj dagire ku bêhna nexweşekî astimê têrê neke ji serî heta dawî wan bixwîne. Li gor rexnegirê mezin ê serdema me, Harold Bloom, ew nivîskarê herî Shakespearane ê serdema xwe bû. Marcel Proust di berhema xwe ya dirêj de komeke rengîn a ji kesên arîstokrat, hunermend, dewlemend, xizmetkarên li dever û taxên zengîn ên Fransayê radixe ber çavan û bi awirên tûj û tenik tevger, têkilî û kesayetiyên wan li qelemê dixe. Lê gelo çîroka li pişt afirandina vê romana mezin çawa dest pê kir, a ku vebêj Marcelê piçûk, ê ku heyran û hezkiriyê temaşekirina bircên narîn ên naqosên dêran e, ji me re neqil dike? Marcel Proust çawa, çima ket pey demên buhurî û çûyî? Gelek bersiv hene bo ku mirov ji bo sebebên afirandina berhemeke hunerî bide, lê em li vir bi a herî piçûk, sade û kurt xuya dike qîma xwe bînin: Ji rûyê madlenekê. Tiştê ku her tim tê serê me hat serê Proust jî. Lê wek hunermendên mezin ew jî serkeftî bû di derxistina tiştên mezin ji tiştên asayî de. Madlena ku Proust di çaya xwe dakir û xwar, tahm û bêhneke ku berê jî kiribû di bîra wî anî, ew bir wê rojê, wê deverê, wê civatê û bi bîranîna wê tahm û bêhnê re xezîneyên baxçeyê hafizeyê li ber wî vebûn. Tahm û bêhn jî nexwe winda nedibûn. Proust rabû tiştên ku jê were bi nav demê de winda bûbûn çûbûn giştan ji nû ve zeft bike û vegerîne. Di akamê de Proust rabihurî bi hemû dewlemendî, reng, tahm û bêhna wê li ser zeviya dema niha danî û ji nû ve ava kir; em jî, wek her tiştê kupiştî dikeve nav çîrokeke, filîmekî, stranekê yan helbestekê maneyeke xweser, tahm û bêhneke dîtir werdigire, ji wê rojê şûn de tahmeke xweştir werdigirin ji xwarina madlenan. Lê xwendevanê kurd êdî li benda tahmwergirtina ji xwendina kurdî a vê berhemê ye jî, vêya ku di rapirsîna kovareke tirkî de wek berhema wergera wê ya tirkî herî baş hat hilbijartin.

# Tunekerina dîrokekê: Heskîf di bin avê de dimîne



NÛJÎN ONEN

**Tirba** Zeynel Beg ya li Heskîfê ku 650 salî ye, ji bo di bin avê de nemîne bi minasebeta projeye Bendava İlisûyê ji cîhê wê vegûhestin cîhê wê yê nû. Piştî vegûhestina tirbê bertekên li hember vê projeyê hatin rojevê. Ji bo li hember derketina vê projeyê, di sala 2006'an de bi endamiya 86 saziyan dezgeheke bi navê "Hewla Jiyandina Heskîfê" hatiye avakirin. Ev dezgeh dixwaze ku ev proje were rawestandin. Aktîvîstê vê projeyê Mehmet Demir dibêje heger ev proje pêk bê dê 55 hezar mirov ji vê projeyê bi awayekî neyênî xisarê bibînin.

Projeye bendava İlisûyê ji sala 1990'î ji îhaleyê re hat vekirin lê ji ber rewşa herêmê ya aborî û siyasî şîrketên herêmê bi vê projeyê re elaqadar nebûne. Li ser vê yekê di sala 1996'an de proje dan şîrketên ji konsorsiyumê pêk tên yên bi navê Balfour Beatty (İngiltere), Impregilo (İtalya), Skanska (İsveç) û ji Tirkiye jî Nurol, Tekfen û Kiska. Piştî ku ev proje hat îlankirin saziyên civakî û sîvîl yên herêmê û yên navnateweyî hatin cem hev, ji bo raya giştî ya welatên xwe kampanya dan destpêkirin. Di encama kampanyaya 2000'î de Skanska, 2001'î Balfour Beatty û Impregilo, saziyên li welatên wan yê krediyan saz dikin temînata wan negirt ser xwe û ji projeyê vekişiyan. Di sala 2002'an de UBS proje fesih kir.

Di sala 2004'an de Karên Avê yê Dewletê bi şîrketên herêmî (Nurol, Cengiz, Çelikler, Temelsu) yê Ewropayî (VA/Tech/Andritz, Züblin, Alstom, Stucky, Maggia û Colencio) konsorsiyumek duyem damezirandin. Di sala 2006'an de merasîmeke sembolîk ya hîmavêtinê danîn û bi awayekî fermî dest pê kirin. Piştî vê saziyên sîvîl û civakî û odeyên pîşeyî dest bi xebatên hevpar kirin. Di vê têkoşînê de bi taybetî li ser Heskîf tê sekinandin. Sedema vê yekê ev e ji ber ku ev bajarê antîk xwedî dîrokeke 12 hezar salî ye û semboleke girîng ya gelê Kurd e. Ev têkoşîn bû sebeb ku konsorsiyuma duyem ya projeya bendava İlisûyê belav kir.

Piştî ku şirîkên projeyê ji projeyê vekişiyan, wezîrê Daristan û Hawirdorê yê wê demê Veysel Eroğlu digot di her şert û mercî de dê ev bendav bê çêkirin. Înşeat ji sala 2009'an ji aliyê du bankeyên taybet yê bi navê Nurol-Cengiz A.O û Andritz Hydro yê Awusturyayî ve birêve diçe. Ev projeya bendavê bi paşguhkirina yasa û peymanên navneteweyî hat plankirin. Çiqas Kampanyayên herêmî û navnetewî, têkoşînên hiquqî birêve çû jî lê ev proje nehat betalkirin. Berovajî vê bi awayekî lezgîn înşeata bendavê berdewam dike.

**Aktîvîst Mehmet Demir armanca çêkirina bendava İlisûyê û xisarên ku dê bide herêmê wiha dibêje:**


"Projeya bendava İlisûyê ya di sala 1950'î de dihat plankirin, ya GAPê jî daxilî vê projeyê kirin û di sala 1997'an de ket ber 'Yap İşlet Devret (YİD)'. Yek ji projeyên Tirkiye ya Bendava İlisûyê ya herî mezin tenê armanca wê çêkirina elektrîkê ye. Projeya İlisûyê ya di pêgeha projeya GAP'ê de ye bi hişê 40-50 sal berê hatiye projekirin. Di heyameke wiha de hemû dinya derbasî enerjiya alternatîf bûye, zanyariyên teknîkî jî hene li gelek cîhên welêt dikarin ji ba û tavê enerjîiyê bi dest bixin lê li ser projeyên bendav û HES'an israr dikin. Projeya Bendava İlisûyê projeyeke hîdro-elektrîkî ye lê ji aliyê rêvebirên navendî ve wek bicîhkirina ewlekariyê jî tê rojevê. Li gor van îddîayan heger ev projeye bidawî bibe cîhên ku mîlîtanên PKK'ê xwe vedişêrin û rêyên tê re derbas dibin dê di bin avê de bimînin û dê tevgera rêxistinê teng bike."

**"55 hezar mirov bi awayekî neyênî dê ji projeyê xisarê bibîne"**

Demir dibêje "Projeya Bendava İlisûyê ji xeynî xisarê wê ya li ser çand û dîrokê dê xisarên neyênî li ser mirovan jî bike. Bi xelasbûna projeyê re 199 gundên Êlîh, Sêrt, Amed, Mêrdîn û Şirnexê û navçeya Heskîfê û li gor hejmarên fermî jî dê bi giştî 55 hezar mirov bandorê bibîne. Heger em mirovên ku di salên 90'î de hatine koçber kirin hesab bikin li dora 78 hezaran û bi çêkirina bendavê jî koçerên ku li ser vê rêyê derbas dibin jî têkeve nav li gor texmînan ev hejmar ji 100 hezarî zêdetir e."

Herwiha Demir wiha berdewam dike: "Yek ji armancên çêkirina vê bendavê jî bêmirovhiştina herêmê ye. Berdêla herî mezin dê zarok û jin bidin. Jinên ku li çolteriyê tevlî hilberînê dibin dê ev li bajaran ji holê rabe. Heger ev proje pêk bê dê xisarê bide hevsengiya ekolojiyê jî. Tenê li Heskîfê di dirêjahiya 12 km li derdora rojavayê herêmê 123 cûreyên çivîkan hene. Bi çêkirina projeya bendavê nêzî 250 kepel, ji 5 hezarî zêdetir şikeft, mizgeft, minare, dêrên dîrokî, qebrên sehabeyan, tirb, pirên dîrokî û nirxên bêhempa dê di bin avê de bimînin. Bi vê projeyê dixwazin bîrê tune bikin û dixwazin ji cîhê wan yê xwezayî ji dûr bixin û bi pergalê re entengre bikin.



## "Projeyên ku çandê tune dikin nayên pejirandin"

Mehmet Demir dibêje taybetmendiya 12 hezar salî ya bajarên antîk heye, li Heskîfê bi tirba Zeynel Beg mizgefta unsurên El Rizk, Süleyman Xan hemû unsurên mizgefta Koç, Kizlar, Ortakapi, hemama Artuklu, Zaviyeya İmam Abdullah, 8 berhemên dîrokî dê ji wir bar bikin. Heger giringî bidana parastina tiştên çandî, weke bendava İlisûyê rê nedidan pejirandina tunekirina çandê û li gel hemû israran ev proje pêk nedihat. Tiştên çandî li cîhê xwe bi wate ne û çend caran me ji raya giştî re got bi gelên herêmê divê bê parastin. Bi rêya Heftenameya Basê em vê dubare dikin.

Heskîf li gor kesên ku dixwazin wê tunebikin ji çend kevir, minare, tirb û şikeftan pêk nayê. Bajarê antîk yê bi xwezayê hatiye pêçan, bi hembêza Dîcleyê, mêvanperweriya şaristaniyê kiriye di heman demê de muzeya ser wê vekiriye. Bi barkirina çend berheman dîroka Heskîfê nayê barkirin.



## "Têkoşîna hiquqî berdewam dike"

Demir dibêje: "Ji bo ku ev proje were rawestandin em têkoşîna hiquqî birêve dibin, çend dozên ku vekirine encam dane û yê AİHM'ê jî hîn berdewam dike. Ji bo barkirina tirba Zeynel Beg bêrawestan doza ku me vekiribû hat redkirin. Ji aliyê din ve biryara doza vê dadgehê hat ber destê me, me îtîraza xwe ji dadgeha istinafê kir lê bêyî dadgeh biryara bê dayîn, tirba Zeynel Beg hat barkirin. Têgihiştineke bi vî awayî heye" Bendav dê di demeke kurt xelas bibe û dê av li her derê belav bibe. Ev fikra ku êdî ji bo Heskîfê tiştek nikare bê kirin tîne bîra mirov. Lê rewş ne wiha ye. Ji bo Heskîfê û Newala Dîcleyê ne dereng e helbet tiştên ku mirov dikare bike hene"





JAN DOST

## Selaheddîn di gorê de jî rihet nahêlin

Kesayetiyên mezin qet namirin. Ew bi tesîra xwe her û her zindî dimînin û heta hezaran sal di ser wan re derbas bibin jî bandora xwe li ser jiyana xelkê dihêlin. Ên ku mohra xwe li tarîxê xistibin, kes nikare mohra wan hilîne lê bi qasî ku ew kesayetî hezkirî û hêjane li ba milyonan mirov wisa jî dijminê wan hene.

Van rojan êrîşek dirrindeyî mezin li dijî Selaheddînê Eyyûbî (1138-1193) tê meşandin. Serkêşê vê êrîşê jî hin rewşenbîrên ereb in û di pêşiyawan de romannivîs û lêkolînerê bi nav û deng Yûsif Zêdan ê misrîye.

Min jî wek gelekan li hevpeyvîna Yûsif Zêdan ya li gel rojnamevanekî kanalek misrî temaşekir û şokbûm. Di wê hevpeyvînê de Yûsif Zêdan dibêje ku Selaheddînê Eyyûbî yek ji pîstirîn serwerên dîrokêye.

Bêguman rojnamevan jî xwe vediciniqîne, û jê dipirse ka ev çawa çêbû? Selaheddîn bi kîjan awayî ji pîstirîn serwerên dîrokê ye? Zêdan weha bersivê dide:

Yek: Selaheddîn dewleta fatimiyan û xelîfetiya wan ji holê rakir, jinên wan ji mêrên wan veqetandin ku zurriyeta wan qut bibe û qir bibin. Du: Selaheddîn Quds rizgarkir lê ji bo xatirê ku xwişka wî di karwanê hecê de rastî heqaret û êrîşa xaçparêzan bûbû. Sê: Kurê wî yan biraziyê wî El Kamil Quds dubare radestî xaçparêzan kir.

Diyar e ku ev lêkolîner bi qesd dixwaze rûpela Sultan Selaheddîn di tarîxê de reş bike. Îcar nikare tiştekî kirêt yan qebahetek mezin î ku qaşo Sultanê Misr û Şamê kiribe bi dest bixe, êdî xwe davêje qerwelkên pûç.

Em werin ser xala yekem: Dûrxistina jinan ji mêran (eger rast Selaheddîn pê rabûbe) nediyar e ku bi çi mebestê bû? Gelo ji tirsa ku careke din li dijî wî dest bidin destên xaçparêzan rabin û dest bi xelîfetiya xwe bikin? Bi her halî ku ew bûyer rast be jî Selaheddîn ew ne kuştin û bi çol û kerbelan nexistin mîna ku Seddam bi serê kurdan kir. Bi milyonan xelk di qirkirinên tevahî de ji kokê rabûn, îcar dûrxistina çend malbatan ji hev ku mirov bide ber wan gunehkariyên mezin hîç ne tiştek e.

Mesela duyem dibêje ku rizgarkirina Qudsê ji bo xatirê ku heyfa xwişka xwe hilîne.

Dibêjin salekê xwişka Selaheddîn Fatime Xatûn bi karwanekî reberê xwe da bû hecê, karwanê hecê rastî êrîşeke xaçparêzan bûbû, gava bihîstibûn xwişka Selaheddîn di nava wî karwanî de ye, tirsiyabûn û devjê berdabûn. Lê Selaheddîn sond xwaribû ku kesê êrîşker ku navê wî Ernat e bi destê xwe bikuje û paşê ew êsîr kiribû û kuştibû jî.

Ev lêkolînerê misrî xîretmendiya Selaheddîn jê re mîna kêmaniyekê dibîne. Xwezî piçek ji xîreta Selaheddîn, parîk ji namûsa wî di pozê serkirdeyên erebên vê demê de jî heba ku pê jinên xwe yên dîl, axa dagîrbûyî rizgar bikirana. Bênamûsî ne pîstirîn sifet e, lê ku sultanekî mîna Selaheddîn ji bo piştgiriya namûsa xwe û xelkê ku wan hikum dike şeran li dar bixe (eger rast sebeb ew tenê be) bûye kêmanî!

Xala dawî ji xwe kesekî biaqil napejirîne. Piştî mirina Selaheddîn, Quds dîsa ji bo demeke kurt kete destê Xaçparêzan. Biraziyê wî El Kamil bi peymanekê bajar radestî wan kir. Selaheddîn di gora xwe de bû êdî bi çi mentiqî dikare sûcdarbe?

Di dirêjiya dîrokê de kurdan alîkariya miletên din kirine, xelîfetîyek ji erdê hilanîne û yeke din li dewsê danîne. Mîna xelîfetiya merwaniyan ku Ebû Mislimê Xorasanî ew ji holê rakir û ya ebbasiyan li şûnê danî. Lê mixabin ew xizmeta wan zû winda dibû, nankorî bersiva wan bû û ew dîmenên ku tê de Ebû Mislim dikujin divê her û her ji kurdan re dubare bibe.

Du beytên erebî hene şairê El Mensûr di hizûra Ebû Mislim de gotiye:

Tu di dewleta Mensûr de yî û dixwazî xedrê lê bikî?

Man ehlê xedrê bavan êteyên kurd in.

Mirov divê dîwarê xwe ava bike. Dîwarê „yetîm" bi serê me neketiye. Niha kurd di pêvajoyek wisa de ne. Divê li xwe bifikirin û li avakirina dewleta xwe bifikirin, li avakirina dîwarê xwe her wekî Xaniyê mezin dibêje, bifikirin:

Macerayê Xizr û dîwarê yetîm bûye selef
Vî zemanî her kesek mîmarê dîwarê xwe ye.